



T.C.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

HÊMANÊN MÎTOLOJÎK DI ROMANÊN HESENÊ METÊ DE

HALİL ABDÜLSEMETOĞLU

167110038

Şêwirmend

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn 2019

T.C.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

HÊMANÊN MÎTOLOJÎK DI ROMANÊN HESENÊ METÊ DE

HALÎL ABDÛLSEMETOĞLU

167110038

Şêwirmend

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**HÊMANÊN MÎTOLOJÎK DI ROMANÊN HESENÊ METÊ DE**” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- ☐ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- ☐ Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../2019

HALİL ABDÜLSEMETOĞLU

KABUL VE ONAY

HALİL ABDÜLSEMETOĞLU tarafından hazırlanan **HÊMANÊN MÎTOLOJÎK Dİ ROMANÊN HESENÊ METÊ DE** adındaki çalışma, tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Anabilim Dalı, Bilim Dalında (varsa) **YÜKSEK LİSANS TEZİ/** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

NAVEROK

NAVEROK	III
KURTEBÊJE.....	V
PÊŞGOTIN	VI
KURTE.....	VII
ÖZET	VIII
ABSTRACT	IX
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM BINGEHA TEORÎK

1.1. PÊNASEYA MÎTÊ.....	3
1.2. MÎTOLOJÎ, EFSANE, DESTAN Û CUDAHİYÊN DI NAVBERA WAN DE.....	5
1.3. TÊKILIYA MÎTOLOJÎ Û EDEBIYATÊ.....	6
1.4. TÊKILIYA MÎT Û RÎTUELÊ.....	8
1.5. TAYBETMENDÎ Û ERKÊN MÎTAN	8
1.6. SENIFANDINA MÎTAN	10
1.7. JIYAN, BERHEM Û KESAYETA EDEBÎ YA HESENÊ METÊ	12

BEŞA DUYEM

KOK Û BINGEHA HÊMANÊN MÎTOLOJÎK DI ROMANÊN HESENÊ METÊ DE

2.1. MÎTOLOJIYA YEWNAN	15
2.1.1. Hermes (Mercurius)	17
2.1.2. Mausayên Perîzade (Perîzadeyên Îlhamê)	18
2.2. MÎTOLOJIYA XIRISTIYANIYÊ	19
2.2.1. Hz Îsa (Mesîh).....	20
2.2.2. Girê Golgotayê	22
2.3. MÎTOLOJÎYA ÎRANÊ.....	23
2.3.1. Behram	24
2.3.2. Ahura Mazda	26

2.4.1.	Destana Memê Alan (Mem û Zîn)	27
2.4.2.	Bekoyê Ewan.....	29
2.5.	MÎTOLOJIYA ÎSLAMÊ	30
2.5.1.	Hz. Adem	31
2.5.2.	Habil û Kabil (Kaîn û Abel).....	34
2.5.3.	Eshab-î Kehf.....	35
2.5.4.	Tofan	36
2.6.	HIN MEKAN Û HÊMANÊN MÎTOLOJÎK	38
2.6.1.	Kevneşopî.....	38
2.6.2.	Kevir.....	39
2.6.3.	Kehanet.....	40
2.6.4.	Barûya Babîlê	40
2.6.5.	Kabos.....	41
2.6.6.	Sêhr.....	42
	ENCAM.....	44
	PÊVEK 1	46
	HEVPEYVÎN BI HESENÊ METÊ RE	46
	PÊVEK 2	51
	KURTEYA ROMANÊN METÊ	51
	ÇAVKANÎ.....	56

KURTEBÊJE

Amd:Amedekar

B.:Berg

bnr.:binêrin

B.Z.:Beriya Zayînê

h.b.:heman berhem

j.: Jimare

hwd.:her wekî din

r.:rûpel

wer.:werger

Weş.:Weşanxane

PÊŞGOTIN

Di edebiyata kurdî de Hesênê Mete ji ber naverok û şewaza xwe ya cudawaz, ji ber ku li gelek welatan geriyaye û gelek serpihatinên cuda borandiye di berhemên xwe de terz û ûslûbeke nuh ava kiriye. Wî di berhemên xwe de bêtir ji remz û nîşanên dînî û bi gelemperî jî yên mîtolojîk sûd wergirtiye. Di dewlemendiya van berheman de rol û bandora hêmanên mîtolojîk şênber e.

Di edebiyata kurdî de, di sohbetên li ser edebiyatê de wek romanûsekî girîngiyê dide mîtolojiyê û tê zanîn ku vê yekê di berhemên xwe de bi hostetî bi kar tîne. Me jî bi vê egerê xwest li ser hêmanên mîtolojîk yên Metê ku di berhemên xwe de bi kar anîne, bisekinin û ji aliyê edebî ve nirxandineke berefireh li ser wan bikin. Ji bilî vê yekê Metê ne tenê ji mîtolojiya Kurdî ji ya Semîtîk ji ya Yewnanî, Îranî, Xiristiyânî û ya ji Îslamê jî sûd wergirtiye û gelek hêmanên wan yên mîtolojîk bi kar anîne. Ji ber ku heta nuha di warê mîtolojiyê de ji xeynî du, sê xebatan, bi awayekî rêk û pêk tu xebatên zanistî nehatine kirin. Em hevî dikin ku ev xebat valahiya di vî warî de hinekî kêmtir bike.

Malavayiyê didim dostê xwe Umran Aran ku di warê diyarkirina nav û mijara teza min de alîkariya min kir. Malavayiyê didim dostê xwe Vecdî Demir ku di warê peydekirin û xwe gihîştina berheman de alîkariya min kir. Malavayiyê didim Mamosteyên xwe M.Zahîr Ertekin ku fikr û ramanên bêhempa da min. Malvayiyê didim şewîrmendê xwe Mustafa Öztürk ku herdem piştgirî da min û şewîrmenditiya min kir. Malavayiyê didim Xanima xwe û zarokên xwe ku di pêvajoya nivîsandina vê tezê de derdê min kişandin û alîkariya min kirin.

HALİL ABDÜLSEMETOĞLU

Mêrdîn 14/06/2019

KURTE

HÊMANÊN MÎTOLOJÎK DI ROMANÊN HESENÊ METÊ DE

HALIL ABDÜLSEMETOĞLU

Her çiqasî dema ku merev qala mitolojiyê dike çanda yewnan û latîn bî bîra merev were jî, hema bêje hemû civakên ser rûqala dinyayê gelek materyalên bi kokên xwe yên dîrokî re girêdayî anîne ku ev materyal bi remz, nîşan, sembol, nav û vegêranan, baweriyên wan yên der barê mirov, دنیا, gerdûn û yezdanan îfade dikin.

Di vê pêla dawî de xebatên li ser hêmanên mîtolojîk ji arkeolojiyê heta dîroka hunerê, ji folklorê heta edebiyatê li gelek qadan bi teql li xwe zêde dikin. Lê ji van qadan tu jê bi qasî xebatên li ser edebiyatê ne berfireh in. Wek ku hûn jî zanin her tişt kare bibe mijara edebiyatê lê tu tiştî qasî van hêmanên di hişê civakan de cih girtî, bi qasî remz, materyal û hêmanên mîtolojîk ku ji kodên civaka xwe zêde bûne, li edebiyatê û li berhemên wêjenasên ku ev hêman di berhamên de bi kar aniye, nîrxên girîng lê zêde nekiriye. Em jî di çarçoveya van hizran de, li ser romanên yek ji romanûs û çîroknûsê girîng yê edebiyata kurdî Hesenê Metê hûr bûn. Em li ser xebitînê bê Metê ev hêman çawa bi karanîne, ev hêman karigeriyeke çawa li berhemên wî kirine.

Bêjeyên Sereke: Hesenê Metê, Mît, Mîtolojî, Hêmanên Mîtolojîk, Mît û Edebiyat.

ÖZET

HESENÊ METÊ’NİN ROMANLARINDAKİ MİTOLOJİK UNSURLAR

HALİL ABDÜLSEMETOĞLU

Mitoloji dendiğinde ilk akla Yunan ve Latin kültürü geliyor olsa da hemen hemen dünyadaki bütün toplumlar tarihsel köklerinden getirdikleri bir takım insan, dünya, evren, Tanrı vesaire konulardaki inanışlarını ifade eden simge, sembol, isim, anlatı gibi pek çok materyale sahiptir.

Bu son yıllarda arkeolojiden sanat tarihine, folklor ve edebiyata kadar birçok alanlarda da mitolojik unsurlar üzerine gittikçe artan sayıda çalışmalar yapılmaktadır. Ama bunlardan hiç biri edebi metinlerdeki kadar çok değildir. Bildiğiniz üzere her şey edebiyatın konusu olabilir ama toplumlarda ve toplumların belleklerinde yer edinmiş olan bahsettiğimiz simgeler meteryaller ve mitolojik unsurlar kadar edebiyata ve bu unsurları kullanmış olan edebiyatçıların anlatılarına eserlere önemli değerler katmamıştır. Biz de bu düşünceler çerçevesinde çalışmamızda Kürt edebiyatının önemli roman ve öykü yazarlarından Hesenê Metê’nin eserleri üzerine yoğunlaştık. Bu unsurları nasıl kullandığını ve bu unsurların onun eserlerinde nasıl etki ettiği ile alakalı bu çalışmayı yaptık. Mitin, mitolojinin yazar üzerindeki etkilerini irdelemeye gayret ettik.

Anahtar Kelimeler:Hesenê Metê, Mit, Mitoloji, Mitolojik unsurlar, Mit ve Edebiyat.

ABSTRACT

MYTHOLOGICAL ELEMENTS IN HESENÊ METÊ'S NOVELS

HALİL ABDÜLSEMETOĞLU

Mythology comes from Greek and Latin culture, but almost all societies in the world have their historical roots. The universe has many materials such as marks, symbols, names and narratives that express their belief in God and other subjects.

In recent years, an increasing number of studies on mythological elements has been carried out in many fields, from archeology to art history, folklore and literature. But none of them is as much as in literary texts. As you may know, everything can be the subject of literature, but the symbols we have mentioned in societies and societies have not given important values to the literature and narratives of writers who use these elements. As part of these considerations, we focused on the works of Hesenê Metê, one of the most important novelists and story-tellers of Kurdish literature. We conducted this study on how he uses these elements and how these elements affect his works. We have attempted to examine the impact of the myth on the author

Key Words: Hesenê Metê, Myth, Mythology, Mythological Elements, Myth and Literature.

DESTPÊK

Me di xebata xwe ya bi navê “Hêmanên Mîtolojîk di Berhemên Hesênê Metê de” ne hemû pexşan be jî, sê romanên (Labîrenta Cinan, Tofan, Gotinên Gunehkar) wî yên ku ji aliyê naverokê ve ji hêmanên mîtolojîk sûd wergirtne wek bingeş girt. Û bi vê yekê re hêmanên mîtolojîk yên di van berhemên de ji bo ravekirin û binavkirinê tespît kir. Bi vê armancê di beşa destpêkê de em li ser pênaseya mîtê û mîtolojiyê sekinîn, paşê me cudahiyan di navbera mîtoloji, efsane û destanan de rave kirin. Di vê beşê de mît çawa derketine holê, cûreyên mîtan, têkiliya navbera mîtê û berhema edebî, em li ser van serenavan jî bi hurgulî sekinîn û agahiyên girîng par ve kir.

Piştî mijarên wek mît û mîtolojiyê em li ser jinenîgariya Hesênê Metê, berhemên wî û nêrîna wî ya li edebiyata kurdî sekinîn. Me agahî li ser berhemên Metê dan. Xweza, deşt, zozan, çiyayên erdnîgariya Kurdistan, hezkirin û bêrîkirina welêt di berhemên wî de çawa rû dane, me yek bi yek rave kirin.

Me di beşa yekem de di ser serpêhatî û nêrînên wî yên derbarê mîtolojiyê de nirxandinek li ser cûreyên hêmanên mîtolojîk kir û yên di berhemên de cih girtine tespît kir. Li ser mîtolojiya Yewnan, Fars û Semîtîk agahiyên ku me dan ne berfireh bin jî bi qasî ku xwîneran têr bike me rave kirine.

Me ji bo beşa duyem hemû pexşan, nivîsar û hevpeyvînên Metê xwend, pê re hevpeyvînek kir. Mîtolojiyên neteweyan yên di van berhemên de bi cih bûne hatin tespît kirin û li ser van mîtolojiyan me agahiyên xurt û mufedar da. Û paşê bi karanîna wan hêmanan di van berhemên de hat ravekirin. Di ravekirina wan hêmanan de jî hêmanên pir bi berev yên hindik ve hat rêzkirin. wek mînak mîtolojiya Yewnan paşê ya Îranî herî dawî jî ya îslamê hat zelalkirin.

Dema ku me di çarçoveya van agahiyên ku me li jorê qalkirî her sê berhemên Hesênê Metê nirxandin me berhem li gora tarîxa çapbûna wan rêz kirin. Ji ber vê yekê li serê her serenavê navên berhemên car bi car hate bi lêv kirin.

Me ewil mînakên hêmanên mîtolojîk yê di berhemên Metê de qal kirin bê ew di kîjan berhemê de hatine bi karanîn paşê jî me ji berhemê cihê hatiye bi karanîn ji bo bibe mînaka şênber neqil kir, di dawiyê de jî me li ser wê mînaka mîtolojîk şîroveya xwe lê zêde kir. Me ji van jêgirtinên xwe de dest rastnivîs û qaydeyên gramerê yê şaş neda. Me li gor girîngiya ku wî di berhemê xwe de daye van hêmanan rêz kir û li ser sekinîn.

Di encamê de jî hêmanên mîtolojîk yê di berhemên Metê de hatine tespîtkirin bi tevahî hat nirxandin, kîjan hêman li gora ya din bêtir cih digire hat rave kirin û agahiyên kurt hat dayîn. Di beşa pêvekê de jî me hevpeyvîna ku pê re kiribû û puxteyên pirtûkên wî bi cih kirin.



1. BEŞA YEKEM

BINGEHA TEORÎK

1.1. PÊNASEYA MÎTÊ

Mît bi taybetmendiye xwe û bi pênaseya xwe mijara lêkolîneke mezin e. Em ê di warê pênaseya Mîtê de nekevin hewla pênasekirineke berfireh. Ji ber mijara teza xwe em ê li ser taybetmendî cûre û kokên mîtolojiyê bisekinin û rave bikin.

Koka peyva mîtê ji “Mîtos”ê tê ew jî peyveke yewnanî ye.¹ Bi Ingilîzî wek mith, bi Rûsî wek mîf, bi Tirkî û Erebî jî wek usture tê bilêvkin.

Ji ber ku her lêkolîner li gora mijara ku li ser dixebite li mîtê nêriye her yekî li gora xwe ew pênase kiriye. Hin jî wan pênaseyan li jêrê hatiye dayîn.

Mircea Eliade mîtê wiha rave dike: “Mît, çîrokek pîroz vedigêre: Meselokên zemanê kevin yên zemanê ‘destpêkê’, bûyerên zemanê kevin, meselokên jî zû ve qediyane vedigêre. Bi gotineke din mît, bi saya serkeftinên heyberên derasayî dixaze bila kozmoz yanî tavahiya heqîqetê dixwaze bila parçeyek jê be, ew heqîqet çawa pêk tê, wê yekê vedigêre.”² Kevintirîn berhemên çandî yên ji aliyê mirovan ve hatine çêkirin mît in. hest, bawerî, nirxdarazî wate bi kurtasî terz û nêrîna wan ya li cîhanê di mîtan de tên jiyandin.³ Di ferhenga Tirkî de, “mît ew hikayetên geleri, mîtos, kes an jî têgehên efsanewî ne ku bi rêya kevneşopî belav dibin an jî bi têsîra hizrên gel tên guhertin.”⁴

Civakên prîmîtîv, Di demên ku nikarîbûn hukm li xweza û li derdora xwe bikin de an wesfên mirovî li bûyerên xwezayî kirine ku bi vê yekê xweza û mirov wekhev

¹ Akalın Samî, Edebiyat Terimleri sözlüğü, Çapa5., İstanbul, Varlık yayınları, Rêbendan 1990, r.193

² Mircea Eliade, Mitlerin Özellikleri, Wer.Sema Rıfat, Çapa2, İstanbul, Om yayınları, r.16

³ Aysun Çetin, Tazmînattan cumhuriyete Türk Aydinlarının Mitolojiye Bakış Tarzı, İzmir, Yüksek Lisans Tezi

⁴ Prof. Dr. İsmail Parlatır, Türkçe Szölük, Çapa 9. Ankara Türk Dil Kurumu Yayınları, 1998, r.1571

kirine an jî wezfên zêdeyî hêza mirovan li wan kirine ku bi vê yekê jî xweza ji xwe mezintir kirine da ku xwe di bin ewlehiya wê de aramtir hîs bikin. Ev meseleya wekhev dîtîna û di ser xwe re dîtîna bûye sedem ku mirov wateyên cihêwaz li mîtan bar bikin. Bilge Seyidoğlu dibêje peyva mîtê di civakên prîmîtîv de wek “fable” û “fiction” hatine binavkirin û rastîna wateya mîtê; ew tiştên biqîmet, pîroz û watedar yên ku em xwediyê wan in.” ev peyva ku îro wek guhertin an jî xerabûna xeyal û rastiyan tê dîtin ji aliyê etnolog, sosyolog û alimên dinî ve wek rîtuêlên pîroz, baweriyên prîmîtîv tên bi navkirin. Di pênasîyêke din ya ferhanga Tirkî de “mît metelokên gel in, ew bi têsîra hêza xeyala mirovan dirûv girtine û bi vîgêranîyê alegorîk ku di hundirê wan de xweda xwedawend û çîrokên gelerî bi pêş ketiye.”⁵

Rojavayîyan heta sedsala 19’emîn jî mît wek tîgehek derezanîstî û xurefa dîtîna bi pêşketîna rasyonelîzmê, fîlozofên yewnanî rexneyên xwe li ser mîtan pirtir kirine wan wek bêqîmet û çîrokên beradayî bi nav kirine. Mît û wek ilm dîrok berawerdi hev kirine, li ber ilmê dîrokê ku xwe dispêre qeyd, delîl û berjengên ilmî, mît wek çîrokên beradayî şîrove kirine. Di dema romantîzma almanan de hizra li ser mît û berhemên folklorîk hatiye guhertin. Hegel mît di pêşketîna şaristaniyan de wek merhaleyek girîng xwendîye. Di sedsala 20’î de fîkîra ku çavkaniya mîtê binehişê mirovan e, derketîye pêş. Freud û şopînerên wî mîtê wek teyîsîna hêstên binehişê mirovan nîrxandîne. Joseph Campbell jî mît wek rûdana binehişê gerdûnî pênasî dîke.⁶

Malinovskî jî mît, wek “bi rêya vîgêranîyê vejîna rastiyeke demeke dûr e.”⁷ Pênasî kiriye.

Dem a ku em bi giştî lê dinêrin ji aliyê gelek kesan ve wek çîrok, hîkayet, an jî metelokên demên kevin hatine pênasîkirin.

⁵ Prof dr. İsmail Parlatur, Türkçe Sözlük, Ankara Dil Kurumuyayınları, 1998r. 1571.

⁶ Dan, Ben- Amos, “Şartlar Ve Çevre İçinde Folklorun Bir Tanımına Doğru”, Wer: Metin Ekici, Milli Folklor, j.33, Bîhar 1997,r. 75-87

⁷Bronislaw Malinowski, Büyü, Bilim, Ve Din, Kabalcı ,İstanbul, 1990 r. 88

1.2. MÎTOLOJÎ, EFSANE, DESTAN Û CUDAHİYÊN DI NAVBERA WAN DE

Ji ber ku gelek caran ji dêleva hev tèn bi kar anîn em dixwazin cudahiyên di navbera mîtolojî û efsaneyan de derxin holê.

Destan di ferhenga tirkî de, “helbesta ku berî dîrokê tê zanin ji xwe re xweda xwedawend, nivxwedawend û leheng kiriye mijar”⁸ Azra Erhat jê re dibêje “epos” Beşir Ayazoğlu jî jê re dibêje “epope” û wiha rave dike: “Mîtosên ku di nav gel de bi awayekî bêlawela cih girtine ku di nav vegotineke helbestane de bi cih bûne.”⁹ Wate destan zewaca mîtos û eposê ye. Mîtos û destan ne di formên nêzîkî hev de ne. Mîtos wek ji hin parçeyên destanan in.

Ayvazoğlu cudahiyên di navbera mîtos û destanan de wiha rave dike, “Forma mîtosan naşibe ya destanan mîtos wek parçeyek ji naveroka destanan derdikevin pêş.”¹⁰

Pênaseya Mît û Efsaneyan tevli hev dibe. Dema ku mît tê penasekirin, têgeha efsaneyê ji bo ravekirinê tê bi karanîn. Pertev Naili Boratov dema ku qala efsaneyê dike dibêje efsane ne pêwîst e tiştên derasayî bihundirîne¹¹ Lê mît gelek tiştên derasayî dihundirînin. Ji xwe hêmanên derasayî yek ji taybetmendiyên wan e. Muharem Kaya di berhema xwe ya di der barê destanan de wiha dibêje, “Mît piroziyek teqez di xwe de dihevine lê efsane ne wiha ne. Efsane di roja me de jî karin bîn afirandin. Lê ji bo mîtan ev yek nikare bê gotin.”¹²

Di vî warî de John Fiske jî wiha dibêje, “Efsane bi gelemperî bi mekanekî an jî du mekanan sînordar e. Yek an jî ji du kesan re tê gotin. Lê taybetmendiyên mîtan yê giştî ew e ku li hemû dinyê belav bûne. Her çi qas nav û bûyerê ku pê mirov kelecânî

⁸ Parlatir, İsmail, Türkçe Sözlük, 2c, Çapa 9., Ankara, Tdk, 1998.

⁹ Beşir Ayazoğlu, Geçmiş Yeniden Kurmak, İstanbul, Kubbealtı Neşriyatı, 1987, r. 70

¹⁰ Beşir Ayazoğlu, Geçmiş Yeniden Kurmak, İstanbul, Kubbealtı Neşriyatı, 1987, r. 73

¹¹ Pertev Naili Boratov, “Türk Efsaneleri” Folkloru Doğru” j.35, Mayıs –Haziran 1974, r.12

¹² Muharrem Kaya, Türk romanında Destan Etkisi, Ankara Kültür ve turizm Bakanlığı Yayınları, 2004, r.28

dibin bèn guhertin jî çîroksaziya esasî li her derê wek hev e. Sedema vê yekê jî ew e ku kokên mîtan xwe digihîne demên gelekî kevin.¹³

Gerdûnîbûna mîtan wan bi vî aliyê xwe ji hemû cûreyên ku dişibin wê vediqetîne. Rosenberg li ser gerdûnîbûna wan wiha dibêje;

“Dê û bavên ewil, bi piranî xwedayên ser rûyê erdê an jî yên esmana ne. Xwedayê afirîner, mirovên ewilî bi piranî bi tiştên wek dar, nebat, herî û keviran afirandiye. Xweda dinyaya faniyan bi kêmanî bi tûfanekê tarûmar dike. Çawa ku li xwezayê ji dayik bûn, mezinbûn, mirin û vejîn heye li fezayê jî heman tişt hene. Leheng zarokên xwedayan e ku bi awayekî derasayî çêdibin, hêzên wan yê derasayî û xurt hene, çekên wan yên taybet hene, karin bi çekên xwe cinawaran bikujin, derdikevin rêwîtiyên awarte, wek parçeyek peywirên xwe dadikevin binê erdê û cardin bi awekî awarte dimirin.”¹⁴

1.3. TÊKILIYA MÎTOLOJÎ Û EDEBIYATÊ

Di destpêkê de mîtolojî ji bo mirovan, rastiyan dînî û sistema baweriyê bû lê bi herikîna demê re bi hatina dînên semawî û bi karîgeriya dema modern re ji wî qalibê xwe derketiye û berev çîrokên sembolîk ve wate guhertiye. Ji ber vê yekê mîtolojî tevî taybetmendiyan xwe yên dinî bi aliyekî xwe ve jî edebî ye. Ji hemû cûreyên hunerê û bi taybetî jî ji edebiyatê re çavkaniyeke heja ye. Wek ku tê zanîn her tişt, li ser rûyê dinê çî hebe û çî karibe bê xeyalkirin, hemû tiştên di ramana mirovan de cih digirin kare bibe kereste an jî mijara edebiyatê.

Ali Şeriatî di pirtûkaxwe ya bi navê Dîroka Medeniyetê de li ser mîtolojiyê wiha dibêje, “Cihana mîtolojiyê ne cihana rastîn e, ew cihana ku divê bibe temsîl dike. Efsane metnên hunerî ne, yanî li gora usûlê, ew berhemên hunerî ne, afirandin in, afirandinên hunerî ne.”¹⁵ Dîrok tiştên di rabirdûyê de qewimîne dikole û vedibêje, Li gora Şeriatî, mîtolojî ji dîrokê bêtir wek arezû, daxwaz an jî tiştên ku mirov xeyal dikin

¹³ John Fiske, Mitler ve Mitleri Yapanlar, Wer: Şebnem Duran, İzmir, İlya Yayınevi, 2006, r.35

¹⁴ Dona Rosenberg, Dünya Mitolojisi – Büyük Destan ve Söylenceler Mitolojisi- Ankara, İmge Kitapevi, 2000, r. 19

¹⁵ Ali Şeriatî, Medeniyetler tarihi 1. Wer. Ejder Okumuş. Ankara, Fecr Yayınları r.112.

dibîne û dibêje, “Lehengên mîtolojiyê ew kes in ku divabû hebûna lê dîrokê destûr nedaye ku bibin.”¹⁶

Îro ji helbestê heta çîrokên gelêrî, ji destanan heta nifirên nav gel, pir an hindik hêmanên mîtolojîk hene. Mircea Elide di pirtûka xwe ya bi navê *Destpêka Dîroka Dînan* de têkiliya edebiyat û mîtolojiyê wiha rave dike,

“Mîta ‘Girava Pîroz’ heta serdema ronîbûn û romantîzmê jî hebûna xwe domandiye. Lê vê girava mîtî êdî wek Girava Aden tê dîtin. Ewil bû Girava Eşqê(Camnoensler), bû Girava Dirindeyên Baş, bû Girava Euthanaus (Eminescu), bû Girava Xewnan ku tê de tiştên xweş û nepen veşartîne, axir veguherî giraveke nuwaze ya betlaneyê. Mirovên modern tenê di bin karîgeriya xeyalên xwe de mane û ev cih xeyal kirine. hin jî xebitîn û rîtma welatê buhişt wek xwe berê ye, tenê (wek ku kitêba Miqedes dibêje) li ser rûyê dinyê guhertin çêbûne. Arketip her çi qas serpêhatinên mirov ji rêze bin jî berdewam “nirxên çandî” diafirîne û hebûnê bilindtir dike. Buiştê di romanên modern de tê qalkirin an Girava Camoensler ji aliyê nirxên çandî ve ne kêmtir edebiyata serdema navîn ya giravan e.”¹⁷

Joseph Campbell û Moyers Bill di pirtûka xwe ya bi navê *Hêza Mîtolojiyê* de têkiliya edebiyatê, têgehên dînî, cihê wê di dezgeha baweriyên din de di çarçoveya mîtolojiyê de wiha rave dike, “Mîtolojî divê di çarçoveya teolojiyê de bê mêze kirin. Mîtolojî pir herikbar e. Mît bi gelemperî bi xwe re di nakokiyê de ne. Dîn, helbestê dike pexşan. Lê ji bo efsaneyan ne hewceye ku ew bûyer bi rastî jî qewimî be. Bûda jî fena Hz Îsa çû buhiştê û cardin vegeriya.”¹⁸ Cardin fikrên wan yên der barê mecaz û heqîqetê de jî wiha ne, “Na, mîtolojî ne derew e, ew helbest e, mecazî ye. Gotineke pir xweş heye, Mîtolojî rastiya dawîn e, na ya berî wê ye. Mîtolojî zêhnê derdixe ji derveyî vê çarçoveya, ber bi tiştê ku tê zanîn lê nayê vegotin ve dibe, "rastiya dawî na ya berî wê” ev e.”¹⁹

¹⁶ Ali Şeriati, Medeniyetler tarihi 1. Wer. Ejder Okumuş. Ankara, Fecr Yayınları r. 109.

¹⁷ Eliade Mircea, Dinler Tarihine Giriş, çev, Sema Fırat, İstanbul, Om yayınevi, r.412

¹⁸ Joseph Campbell, Moyers Bill, Mitolojinin Gücü, Wer. Zeynep Yaman, İstanbul, Mediacat Yayınları, r.185

¹⁹ Joseph Campbell, Moyers Bill, Mitolojinin Gücü, Wer. Zeynep Yaman, İstanbul, Mediacat Yayınları, r.212

1.4. TÊKILIYA MÎT Û RÎTUELÊ

Dema ku pirs a mît çawa gihîştine roja me tê kirin zanyarên di vî warî de pîspor, rîtuêlan destnîşan dikin. Rîtuêl tê wateya ayînê. Tekiliya rîtuêlan û mîtê kare bi jiyana mirovên prîmîtîv bê ravekirin. Mirovên wê dema serpêhatî û azmûnên xwe yê bi xwezayê re, bi mîtan sembolîze kirine. Ji bo ku karibin azmûnên xwe ji neviyên xwe re bihêlin ji mîtan sûd wergirtine. Wek alavek guhastinê mît bi kar anîne. Rituel li gora modela kozmîk ya afirandinê (afirandina cîhanê û ya mirov) tê pêkanîn. Çîroka afirandinê ku wek destpêka hemû tiştî tê bikaranîn, bingeha van serenomiyan bi xwe ye. Çîroka afirandinê bi dansan tê sêwirandin. Bi vê sêwirandinê temaşevanên vê temaşeyê xwe wek di wextê rastîn yê vê afirandinê hîs dikin û wek şahidekî vê bûyerê dihesibînin.²⁰

Rîtuêl ji ber ku bûyerên arketîpê tînin meydana disêwirînin, yê vê sêwirandinê ezmûn dikin, dema jiyîna arketîpê ji hîs dikin. Ew dema ku em qal dikin, “dema mîtî ya bi kokan ve girêdayî” derdixe holê û wek demeke nû tê bi navkirin. Ji ber ku dema pêkanîna rîtuêlê de tê hîskirin, bi saya hêmanên derasayî ya xurt û afirîner di mîtan de karîgeriyeke erênî çêbûye. Di dema xwendina Mîtan ya jiber, vedigerin vî aliyê mîtan yê çîrokî, loma bi ew tişt û bûyerên tê bibîranîn re dibin “hevdem”, dibin şahidê bûna leheng û xwedayan. Yanî yê kesê ku rîtuêlan dijîn derdikevîn derveyî kronolojiya demê û ber bi wexteke, dema ku dê hetahetayê bê girtin, bê zevtkirin ve dihere.”²¹

1.5. TAYBETMENDÎ Û ERKÊN MÎTAN

Pênase û ravekkirinên ku me heta nuha kirine ji me re kare bibe bingehek ku em karibin qala taybetmendî û erkên mîtan ji bikin. Taybetmendî û giringiya mîtan ya di nav gel de bûye sedem ku di nav mirovan de bibe xwedî erk jî.

Mît çîroka bûyerên derasayî pêk tînin. Ew jiyana berî nuha, jiyana kevn ji xwe re dikin mijar an jî ne taybetmendiyeke lokal û bisînor, ew vegotina zagonên organîk

²⁰ Carl Gustav Jung, Dört arketip, Wer. Zehra Aksu Yılmaz, Metis Yayınları, İstanbul, r.78

²¹ Mircea Eliade, Dinler Tarihine Giriş, Wer. Lale Aslan, İstanbul, Kabalcı Yayınevi, r.29

yên xwazaya objeyan ji xwe re dike armanc.²² Ev taybetmendî bûye sedem ku mirovê prîmîtîv karibe hukm li ser xwezayê bikin.

Mît divê di çarçoveya mantixê de bê nirxandin. Rast e bûyer û lehengên wan dibe ku derasayî be jî di hundirê xwe de divê bi mantixekê ve bê girêdan. F. Bayat. Di pirtûka xwe ya bi navê Destpêka Mîtolojiyê de vê yekê wiha rave dike, “Mîtoloji hewldanek e, hewl dide ku derketina Kozmosê, îdolojiya hebûnê(existentialism idology), tiştên ku mirov dorpêç dikin; yên ruhber yên bê ruh, yên razber, yên şênber, madî manewî, fam bike.²³

Mirov bi saya mîtan koka objeyan dibînin, û di ser dirûvdayîna wan objeyan re hukmekê li wan dikin. Tişt û mijarên ku mît derdixin holê, wek rastîn û pîroz tîr qebûlîkirin ku di derketina wan û di pîrozbûna wan de karîgeriya bûyerên xwezayî gelek e. Tê qebûlîkirin ku mît, di pêketina şaristaniyan de xwedî roleke mezin e. Bi taybetî merev kare tîkiliyekê di navbera formên objeyan yên ewilîn û nîmûneyên wan yên pêşketî de tîkiliyekê deyne û vê yekê îspat bike. A. Çaycı di teza xwe ya bi navê Mîtoloji û dîn de li ser vê yekê wiha dibêje, “Ji ber ku mît di nav baweriyên, derveyî zanîne û nîkarin bîr venêrîn tîr qebûlîkirin, tenê bi gotîne re sînordar dimîne. Bi vî aliyê xwe rehenda întikala vê çanda qedîm ya heta roja me temsîl dike. Dûrî pratîkkirin û veguhestinê ye, lê wek hêmana nostaljiyê cihê xwe yê di ezîtiyê (personality) de parastîye. Her çî qasî jî van tîgehên yek jê (Efsane û mît) jî dêleva ya dîn hatibe bikaranîn jî, mît bêtir li ser avabûna alemê û li ser afirandinê sekiniye û li ser van mijaran hûr bûye. Ya dîn bêtir li ser mijarên wek lehengî ku bêtir civakê eleqedar dike sekiniye. Pîrozweriya mîtan li gora ya efsaneyan bêtir e.²⁴

Bi gelemperî taybetmendiye Mîtan

Vegêraneke pîroz e.

Giraniyeke mitan ya remzî û pîroz heye.

²² Pierre Grimal, Mitoloji Sözlüğü Yunan ve Roma, Wer. Sevgi Tamgüç, Sosyal Yayınları, İstanbul, 1997, r.16

²³ Fuzuli Bayat, Mitolojiye Giriş, Karam Yayınları, Çorum, 2005, r.5

²⁴ Ahmet Çaycı, Mitoloji ve Dîn, Eskişehir Anadolu Üniversitesi Açıköğretim Fakültesi Dergisi, 2012 r.6

Ji mirovên ewil re ji bo karibin dinyê û afirîner fam bikin ji pirsên wek çima û çawa re bûne bersiv.

Lehengên wan xweda, xwedawend û nîvwxweda ne.

Zeman û mekan kozmîk e. Li ser nexşeyê û di zemanêke diyar de nayê ravekirin û nayê nîşandayîn.

Her dem bi afirandinekê ve girêdayîye. Tiştek çawa derbasî dinyê bûye, nexweşiyek, saziyek, awayek xebitandinê, çawa hatiye afirandin li ser vê vedibêje.

Mirov bi zanîna mîtê re, bi analîzkirina wê re, koka objeyan jî dielime. Li vê derê ji derve zanîneke razber nîne, zanînek ji jiyanê re şênber heye

Wateya xwe ya rastîn tenê kare di nav civaka ku lê peyda bûye de bîn dîtin. Remz û sembolên ku di xwe de dihevin tenê di nav civakên ku ew tê de hasil bûne de watedar e. Di nav civakên din de ji ber ku ew ê peyamên ku bi remzên mîtê re tên dayîn neyên famkirin, tenê di nav civaka xwe de watedar e. Bi kurtasî mît, di nav civaka ku tê de derketiye de çê dibe û dimire.

Di nav civakên extiyar de cihekî wan yê jêneger heye. Baweriyan tîne zimên, rêgezên ehlaqê diparêze, wan dide qebûlkirin. Mît di civaka xwe de her wek rastiya ku tê pê şewirandin, dijî.

Li gora dîrokzan û zimanzanên sed sala bîstemîn di navbera mîtan û dînan de têkiliyeke xurt heye.²⁵

1.6. SENIFANDINA MÎTAN

Mît, wek mijar afirandina alemê, afirandina mirovan, rabirdûya nebat û ajalan lê dikole. Ev lêkolîn ji aliyê mîtolojî û kozmogoniyê ve tê kirin. Bi pênasîya xwe ya giştî kozmogonî, gerdûn+jidayikbûn e. Heger em ji aliyê wateyê ve lê binêrin em bêtir bi zanînen mîtîk û nezanistî dibînin. Ev pênasî bi piranî di nav efsûn û mîtan de wenda

²⁵ İ. Sarı, Türk Halk Edebiyatına Giriş-II Ders Notları. (20.09.2019) : http://www.isa-sari.com/ders-notlari/THG_2.pdf

bûye, bi bûyer û efsaneyên afirandinê hatiye rave kirin. Bi vê pênasîyê rasterast meseleyê zelal neke jî şirovekirina dinyaya beşerî û heyberî, xwestîye bersivê bide pirsên çawaniyê. Her çi qasî ev heyber xwedî taybetmendiyên yezdanî bin jî, hin ji wan başiyê hin ji wan nebaşiyê bêtir bi wateya xwe ya dijberî hev, nîrxandina du etîkên, du prensîbên dijberî hev du, nîşan dide.²⁶

Çawa di pênasîyên mîte de di navbera kesên pîspor de cudahî hebin di ware sinifandina wan de jî nêrînên ciyawaz hene. Hêmanên hewayî ku di naveroka mîtan de li alema fambar de parçeyeke girîng in, hatine peywîrdarkirin ku bibin parçeyek alema beşerî.²⁷

Fûzûlî Bayat, mîtan bi gelemperî wek du beşan disinifîne û lêdikole;

Kategoriyên giştî û yên taybet. Kategoriyên giştî di nav hemû hêl û civakan de tên dîtin. Merev kare van mîtan wek çar serenavan bisinifîne. Mîten kozmogenî, yên afirandinê ne, û kategoriyên taybet jî di nav her gelî de bi awayekî din belav bûne. Hin ji wan bi vî awayî ne; Teogenî (der barê xwedayan de ye.), Etiyolojîk (der barê koka moravan de ye-orjîn-) Eskatolojî (der barê dawîya dinyayê de ye.) mîten totemî û mîten lehengî.²⁸

Mîten Kozmogonî

Ev cureya mîtan wek mîten afirandinê jî tên bilêvkirin. Li gora van mîtan cîhan ji tunebûnê hatiye afirandin. Mîten kozmogenî qala cîhana berî ku mirov bîn afirandin dikin li gora vê yekê ewil ji kaosê derbasî sistema birêkûpêk ji wê merhalêyê hatine kozmozê.

Mîten orjîn

²⁶ Ahmet Çaycı, Mitoloji ve Din, Eskişehir Anadolu Üniversitesi Açıköğretim Fakültesi, 2012, r.6

²⁸ Fuzuli Bayat, Türk Mitolojik Sistemi (Ontolojik ve Epistemolojik Bağlamda Türk Mitolojisi). C 1, İstanbul: 2007, Ötüken Yayınları, r.15

Ev cûre mît wek devam û temamkerê mîtên kozmogenî tên hesabandin. Mîtên orjîn, cîhan çawa bi pêş ketiye, çawa bi paşve çûye çawa dewlemendtir an jar bûye... li sar van mijaran disekine.

Mîtên Nuhbûn û vejînê

Ev cûre mît di nav civakên bi cotkariyê re emel dikin, tê dîtin. Misir, Mezopotamya, yewnanîstan, civakên kevin yên Rojhilata Navîn karijn bibin mînakên baş. Ji bo mirovên prîmîtîv zeman ew çember e her dawî û ji nû ve çerx bûne.²⁹

1.7. JIYAN, BERHEM Î KESAYETA EDEBÎ YA HESENÊ METÊ

Jiyana Wî

Hesenê Metê di sala 1957an de li Erxeniya Diyarbekirê li gundê Teiyê hatiye dinyayê. Lê Hesenê Metê di diwazde saliya xwe de ji ber sedemên malbatî ji gundê xwe veqetiyaye. Li Mêrsînê dibistana navîn û lîse qedandiye. Lê weke gelek xortên salên heftêyî Hesenê Metê jî di bin bandora siyasetê de maye û hatiye girtin. Paşê jî ji ber darbeya leşkerî mecbûr maye ku derkeve derveyî welêt. Pêşî li Îranê û paşê jî li Iraqê tevî refên peşmergeyan bûye. Piştî sê salên peşmergeyî di ser Sûrî re çûye Swêdê. Ew bi qasî 30 salan e ku ji welêt dûr e. Hin kitêbên wî ji bo erebî û tirkî (Tofan, Labîrenta Cinan û Gotinên Gunehkar) hatine wergerandin, hinek jî li şanogehên Amed û Stenbolê (Epîlog) bûne piyes. Wî bi xwe jî ji Pûşkîn, Çexov, Dostoyevskî û Göran tunström bo kurdî werger kirine. Gelek kurteçîrokên wî di antolojiyên tirkî, swêdî û almanî de cih girtine heta nuha gelek berhem û wergerên Hesenê Metê hatine çapkirin. Hesenê Metê nuha jî li Swêdê li bajarê Stokholmê jiyana xwe didiomîne.³⁰

Berhemên Wî

²⁹ Mircea Eliade, Mîtlerîn Özellikleri, Wer. Sema Fırat, Çapa 2. , İstanbul Om Yayınları, 2001 r. 66

³⁰ Hevpeyvîna ku Hesenê Metê re hatiye kirin. (Di pêvekê de ye.)

Hemû berhemên Hesênê Metê bi çapên xwe yê nuh ji aliyê weşanxaneyê Peywendê ve hatine çapkirin. Li gora navlêkirina weşanxaneyê pênc pirtûkên wî yê çîrokan (çîrokên gelerî jî nav de) û pênc pirtûkên wî yê novel (li gora ku em fam dikin bi peyva noveleê qesta wan romanên kurt e) hene.

Berhemên wî yê çapbûyî ev in:

- a) Simîrnoff (Çîrok, 1991)
- b) Ardû (Çîrokên Gelerî, 1991)
- c) Labîrenta Cinan (Novel, 1994)
- d) Epîlog (Çîrok, 1998)
- e) Tofan (Novel, 2000)
- f) Gotinên Gunehkar (Novel, 2007)
- g) Li Dêrê (Novel, 2011)
- h) Pêşîrên Dayê (Çîrok, 2013)
- i) Îşev û Çîroka Şeva Dawîn (Çîrok, 2014)

Kesayeta Wî ya Edebî

Hesênê Metê yek ji nivîskarên girîng yê edebiyata kurdî ye ku berhemên girîng û ji aliyê edebî we dewlemend nivîsiye. Wek tê zanîn Şivanê Kurd ku wek yekem romana kurdî zanîn û ji vir ve gelek berhem û romanên kurdî hatine nivîsandin. Ji edebiyata underground bigire heta yê tevn- zanistî ji yê biyografîk heta yê dîrokî ji her cûreyê hatine nivîsandin.

Di van romanên de ji hinek ji wan mijarên derasayî ji xwe re kirine mijar hinek ji wan jî vegotina xwe bi vegêranên mitolojîk dewlemend kirine. Hesênê Metê jî yek ji wan nivîskaran e ku mijar, hêman û motîfên mîtolojîk di romanên xwe de bi kar anîye, çîrok novel û roman nivîsandine. Hesênê Metê bi çavê tiştêkî efsûnî bi çavê

mijarên derasayî yên ji mirovên kevin mayî limîtan û hêmanên mîtolojîk dinêre û jixwe wiha jî bi kar tîne.



2. BEŞA DUYEM

KOK Û BINGEHA HÊMANÊN MÎTOLOJÎK DI ROMANÊN HESENÊ METÊ DE

2.1. MÎTOLOJIYA YEWNAN

Wek hemû neteweyan Mîtolojiya Yewnan jî bi afirandina gerdûnê û bi jidayikbûna yezdanan dest pê dike. Yewnanên ku erdê avê û esîmanê wek yezdan dihesibînin, serpêhatinên van yezdanên xwe yên ewil kirine sembola hadîseyên hewayê.³¹ Li gora Hesiodos, peyva Khaos heye ku di zimanê yewnanî de te wateya kendalê bi wateyeke din valahiya bêserûbinî û tariyê. Ji Khaosê erd çêdibe ku ew jî bingeha hemû tiştî ye. Paşê bingeha hezkirinê, yezdana ku hemû heyberan digihîne hev, sembola zêdebûne, Eros yanî eşq çêdibe. Paşê Khaos bi Ereboşa ku jê çêbûye re dibe ye kû ronahiya tebeqeya di ser rûyê erdê re yanî Aitherê û paşê ronahiya erdê yanî Hemerayê çêdike. Di vê navberê de Gaia, Ouranos û Pontusê (Bahrê) tîne ser rûyê erdê. Ji bi yekbûna Gaia û Ouranos, Kyklop çêbûne. Kyklop dişibin yezdanan lê li ser eniya wan çavekî wan tenê heye. Cardin ji bi yekbûna Gaia û Ouranos Hekatonkheir çêbûne ku sed milên wan hene û li ser piştê wan jî pêncî serên wan hene. Cardin ji bi yekbûna wan Tîtan çêbûne ku şeş bira û şeş xwuşk in. (Okeanos, Koios, Krios, Hyperion, İapetos, Kronos, Theia, Rhea, Mnemosyne, Phebe, Tethys, Themis) ji bi yekbûna Gaia û Pontus jî yezdanên bahrê çêbûne. Piştî ku Ouranos ji tirsê ku ew ê zarokên wî, ew ê wî jî texta wî bikin, ew xistin binê erdê, Gaia hewl dide ku wan li hember bavên wan sor bike, lê tenê kare Kronos kanih bike. Kronos bi tirpana ku dêya wî daye destên wî bavê xwe dike. Ji xwîna Ouranos ya li erdê xwedawendên qehrê Erinys û Gigant û periyên daristanê dibin. Parçeyên bixwîn yên ku Kronos avêtibûn behrê kefên sipî çêdike. Kefên sipî jî Aphroditeê çêdike. Bi mirina Ouranos re Kronosê ku dibe xwediyê Kainatê, Titanan (xwuşk û birayên xwe) ji binê erdê derdixe. Di vê demê de afirandina Kerberos, (Kûçikê Hades) Afirandina Eosê (Zeraq), û ya

³¹Şefik Can, Klasik Yunan Mitolojisi, İnkılap Kitapevi, İstanbul, 1970 r. 5

Zephyros(Bayê rojhilat) tê wateya ku afirandin didome. Kronos bi xwuşka Rhea re dizewice. Ji vê zewacê sê qîzên bi navê Demeter, Hestia, Hera û sê kurên bi navê Hades, Posiedon û Zeus çê dibin. Kronos ji tîrsa ku ew ê ji wek bavê xwe ji aliyê zarokên xwe ve bê kuştin, dil dike ku wan daqurtîne. Rhea Zeusê kurê xwe li çiyayekî vedişêre û keviyekî dixê şûna wî û wî kevira bi Kronos dide daqurtandin. Piştî ku Zeus mezin dibe ji şikeftê derdikeve xwuşk û birayên xwe bi bavê xwe dide verişandin û bavê xwe dişîne binê erdê. Zeus bi xwuşka xwe Hera re dizewice û bi yezdanên din re li Çiyayê Olymposê bi cih dibe. Ji bo karibe hukm li kainatê bike bi Titanan re şer dike.³² Hades bi navêkî xwe yê din Pluton yezdanê welatê miriyan e. Ew giyanên miriyan ji devê wolkanan û ji şikeftan dadixe jêr.³³

Merev kare bi hêsanî bêje ku yek ji devlemendtirîn mîtolojiyên cihanê Mîtolojiya Yewnan e. Mîtolojiya Yewnan bêtir qala xweda, xwedawend û lehengên mîtolojîk dike û bi rêya edebiyata devkî ava bûye û bi pêş ve ketiye. Em Agahiyên xwe yên îro ji berhemên edebiyata devkî yên hatine nivîsîn werdigirin. Mîtolojiya Yûnanan ji Rojhilata Nêz heta Ewropayê tesîreke berfireh li hemû edebiyatan kiriye.

Di efsaneyên vê mîtolojiyê de gelek xweda û xwedawendên Yewnan di forma însanan de ne. Mîtolojiya Yewnan bi çîroka afirandinê dest pê dike. Di vê çîrokê de 12 xweda û xwedawendên bijartî li çiyayê Olymposê rûdinên. Û her tişt bi şerê xwedayên Olympos û Tîtanan dest pê dike û bi serkeftina Olymposiyan bi dawî dibe. Piştî şer Titan tîrî cezakirin. Bi temamî 12 Xweda ne. Ev hejmar tu carî nayê guhertin. Dema ku yek li wan bê zêdekirin yekî din an jî yeka din tê derxistin. Efendiya brûskan Zeus di gelek şeran de zora bavê xwe Kronos û alîkarên wî Titanan biriye û dinya li xwe û sê birayên xwe par ve kiriye. Li gora pişka ku kirine esîman ji Zeus re, behr ji Posiedon re, binê erdê ji Hades re, dikeve. Piştî vê pişkkirinê herkes derdikeve çiyayê Olymposê dest birêvebirina dinyê dikan.³⁴

³²Eckart Peterich, Küçük Yunan Mitologyası, Wer. Yakup Baydur, Maarif Kitapevi, Ankara, 1959, r 6

³³Peterich h.b r. 54-56

³⁴ http://tr.wikipedia.org/wiki/yunan_mitolojisi

Bi rastî Metê ne gelek be jî têra xwe sûd ji Mîtolojiya Yewnan wergirtiye. Em di vê beşa de di berhemên Hesên Metê de çiqas û çend hêmanên mîtolojîk yê Mîtolojiya Yewnan hene di çerçoveya wêje û mîtolojiyê de binirxînin.

2.1.1. Hermes(Mercurius)

Hermes di destpêkê de xwedawendekî bereketê yê Akadiyê³⁵ ye. bi demê re bûye fenek û xapînoktirîn xwedawendê yewnanan. Li gora efsaneyê ew kure Zeus û diya wî Maiyê ye û li şikefteke dûr hatiye dinyayê. Paşê ew ê xeberdoxiyê ji bavê xwe re bike û miriyan bibe welatê miriyan. Belkî navdartirîn serboriya wî ew e ku wî ji bo xelaskirina hezkirîya bavê xwe Zeus, Ioyê cenawirê sedçavî Argos kuştîye. Tevî ku parêzgerê bazirganan bû, bi kesayetîya xwe ya fenbaz xedawendê dizan jî bû. gerokên ku ji aliyê wî ve dihatin parastin ji bo malavaiyê di cihê ku derbas dibûn re stûnên çargoşe yên bi navê *hermae* diçikandin. Ji ber ku mûcîdê zarên qumarê bû wek xwedawendê şens û dewlemendiyê jî dihat rêzgirtin. Ji ber hunerên wî yên dîplomasiyê wek xwedawendê zimên û hîtabetê jî dihat dîtin.³⁶ Hermes bi gotîneke din Mercurius li gora ku tê gotin ev xwedawendê ku çawa ji pêçekê derdikeve keriyên pez yên Apollo didize, peymanan bi Apollo re çêdike, bi kesên ku ticaretên dîkin re dibe alîkar û wan diparêze, li ser rûyê dinyê ji rêwiyên ji cihekî diherin cihekî din re rêbertiyê dike û wan diparêze û ruhê miriyan dibe ba Xwedawendê binê erdê Hades.³⁷

Metê Di pirtûka Gotinên Gunehkar de dema ku Behramê Xwendekar di xewna wî de(belkî jî dimire û cardin vedigere.) li Nagînayê digêrîne, Li camerekî rast tê Navê wî Mekrûsê. Ev camêrê ku dawiyê em ê fam bikin ku bi gelek awayan ve di pirtûkê de cih digire alîkariya Behram dike. Li gora Çîroksaziya Pirtûkê Behram ne di xewnê de ye jixwe miriye Mekrûs jî wek Hermesê Xwedawend bi navê xwe yê din Merkus (Mercurius/bi navekî xwe yê din Hermes) alîkariya wî dike ku wî dibe ba Mîrê Mezin di vê sahneyê de Mîrê Mezin wek Hades û Merkus jî Hermes dikeve bîra merev:

³⁵ Arkadia/Arcadia: Bajarekî yewnanîstanê ye. Li li naverasta Yewnanistana kevin bûye navê bajarekîbaşûrê Girava Morayê. Navê xwe ji arcas wergirtiye.Çavkanî:
<https://tr.wikipedia.org/wiki/Arkadya>

³⁶ Mîtoloji, Editor: Juliane Von Laffert,wer. Nurettin Elhüseynî, Ntv Yayınları, İstanbul, 2010, r.76

³⁷ Azra Erhat, Mîtoloji Sözlüğü, Remzi Kitapevi, İstanbul, 1972, r.376

“- Ji min re qala cenabê te kirin... behsa çêyî û qenciya te kirin... dizanim ne yekî ji mala we me, lê ez dixwazim cenabê te qencyekê li min bike, min ji malê bihesibîne û rê nîşanî min bide ez dixwazim Demorayê bibînim.... –Anuha bide pey min, dibêje.”³⁸

Di vir de cihê girîng ew e ku hayê Metê ji Mîtolojiya Yewnan heye, tevî ku navê Hermes bi kar nayine jî bi hemû taybetmendiyan wî cih dide wî û li gora peywira wî ya di mîtolojiyê de jî bi cih dike.

2.1.2. Mausayên Perîzade (Perîzadeyên Îlhamê)

Mausayên qîzên Hatranaya Hevala Apollon, xwedî dengên xweş in. Ew zana ne, hawiz û çavkaniyên avê ji xwe re dikin cih û war. Tu newa û stran ji bo wan ne nenas e. Ew bi rabirdûyê jî zanin û bi sibêrojê jî. neh perîzade hene.³⁹ Helbet her yek ji van Perîzadeyan bi tiştekî re aleqedar dibe. Yek ji wan li flutê dixê dora xwe şên dike, yek jê di guhê zatên serkeftî de stranên serkeftinê dibêje ya êşên dramatîk derdixe ser dikên şanoyê yek jê gava mirovên dans dike sererast dike.

Hesenê Metê di Gotinên Gunehkar de di gelek deveran de bi gelek kesan van perîzadeyan tîne bîra me û di çend cihan de bi lêv jî dike. Nagîna qîza Lûlûxanê Mazûvanê wî ye û Behramê serlehengê Romanê jî çawa wê dibîne dil dikeve wê. Û di pirtûkê de bi vî rengî wê dişibîne Mauseyên Perîzade:

“Nagîna li ser devê hawizê sawanan dişo, diguvêşe û dide ser hev. Fîstaneke şîfon li bejnê ye, dawa fîstan di ser piştê xwe ve kiriye, delingên xwe heta jora çogên xwe hilçînîne, yek bi yek sawanan bi avê de dike, datîne ser tahtê û bi lingan dikeve ser bi wan sawanên şil danseke îlahî dike...”⁴⁰

Li dereke din pirtûka Gotinên Gunehkar de Lûlûxan qala hawizekî ku perî û cinên dihatin xwe lê dişuştin dike:

³⁸Metê,Gotinên Gunehkar, r.59.

³⁹ Şefik Can, Klasik yunan mitolojisi,İstanbul, Kabalcı Yayınevi, 1970, r.68.

⁴⁰Metê,Gotinên Gunehkar, r.43

“-Ev hawizê ha, dibêje... gola cin û periyên bûye û ev kozika kevirîn jî cîhê nêçîra mezinê wê demê bûye. Li gor gotinan... gotinên ku hîn jî li van deran mîna rastiyeke bi lêv dibin ew e ku: perîzade hatine ku xwe bişon, mezinê vî cîhî jî di hundurê vê kozîkê de rûniştiye. Dema perîzade hatine ku xwe bişon mezinê vî cîhî di hundurê vê kozika kevirîn de de temaşeya wan kiriye.”⁴¹

Cardin di cihekî din yê heman pirtûkê de Lûlûxan ji Behram re qala perîzadeyekê dike ku ji aliyê şivanekî ve ji bo zewacê hatiye mecbûr kirin. Li gora çîrokê tûrê şivan yê bi hesin hatiye neqîşandin bi şaşî li ser cilên perîzadeyê ketiye. Ji ber ku perîzade nikare nêzîkî hesinan bibe ji şivan tika dike ku tûrê xwe rake:

“-Na, ez tûrê xwe î bi xelekên hesinî ji ser kirasê te ranakim. Ku tu nexwazî bi min re bizewicî, ez ê tûrê xwe ji ser kirasê te ranekim.” Perîzade rabûye û ji naçarî bi gotina wî kiriye.”⁴²

Cardin di heman pirtûkê de ji bo Nagînayê Behram wiha dibêje:

“Ez radibim di cîhê xwe de rûdinim. Rûdinim û dibînim ku Nagîna di vê heyveronê de mîna dotmîreke şevê di avê de ye. Dema ji avê derdikeve û ber bi min tê laşê wê mîna peykereke zîvîn dibiriqe... rasterast bûye peykereke ji avê û di heyveronê de lewtiye.”⁴³

Wek ku tê dîtin ew ji van periyên îlhamê sûd wergirtiye û di berhema xwe wek hêmanek mîtolojîk bi kar anîye, dema ku bi cih kiriye ji bilî tekiliya wan ya bi avê re taybetmendiyên wan yê wek dansê, wek heyv û stêrkan ve girêdayî û yê hezkirinê jî derxistiye pêş.

2.2. MÎTOLOJIYA XIRISTIYANIYÊ

Ji dema ku baweriya Xiristîyaniye belav bûye û heta nuha nîqaşek ku bi dawî nebûye heye li ser jiyana Hz Îsa û hewariyên wî ku ji ber çîrokên mîtolojîk hatiye girtin an nehatiye girtin. Bi taybetî mizginiya ji dayîkbûna Îsayê biçûk, serdana Kralên

⁴¹Metê, Gotinên Gunehkar, r.34

⁴²Metê, Gotinên Gunehkar, r.35,36.

⁴³Metê, Gotinên Gunehkar, r.55

ramildar (muneccîm) ji bo Îsayê pitik, çekirina şerabê ji avê bi destê Hz Îsa, Meşa Hz. Îsa li ser avê, ji nû ve jînkirina wî ya miriyan, pirkirin û zêdekirina Hz. Îsa ya nan û masiyan û axir ji nû ve jînbûnû firîna ezmanan. Jiyana Hz. Îsa ya bi mûcîzeyan ve mişt û tije bûye sedem û navenda van nîqaşan.⁴⁴

Xiristiyanî yek ji wan dînên xelasker û îlahî ye ku wek “xelaskirina mirovan ji tengasiyên wan” tê tarîfkirin. Ew tiştê ku dixwaze însanan jê xelas bike mirin e. Hz Adem û Hewa li buhiştê mêweya ku xwedê li wan qedexe kiribû dixwin û ji buhiştê tên avêtin. Ev tiştê ku wan kiriye guneh e wek ceza xwedê wan davê dinyayê. Parçeyek ji jiyana dinyê jî mirin e, ew jî dixwaze însana ji vê yekê xelas bike. Ev guneh ji aliyê Hz. Adem û Hz. Hewa vê tê kirin lê gunehê vî sûcê wan dema ku insan çêdibin bi xwe re digerin: Doktrîna eslî ya gunehan. Ew gunehkar ji diya xwe çê dibin. Loma ji insanê ewilî heta dema Hz Îsa, ji bo hemû gunehên hemû însanan yê ketine ser hev kefaretek mezin divê. Kefaretek bi vî rengî tenê bi mirina kurê Xwedê, Hz. Îsa pêk were. Ji ber vê yekê Xwedêji bo şevqet û merhameta xwe ya li hember însana nîşan bide Hz îsa ne wek yekî nemir, wek yekî fanî şandiye dinyayê û xwestiye bi çarmîxê bê kuştin. Hz. Îsayê ku bi çarmîxê hatiye kuştin derbasî welatê miriyan bûye û piştî sê rojan cardin bi ruh hatiye û çûye qatê bavê xwe. Li gora xiristiyanîyê mesihbûna wî jî ji ve vejîne tê.⁴⁵

2.2.1. Hz Îsa (Mesîh)

Li gora dînê xiristiyanîyê Hz Îsa kurê Xwedê, Xwedê û di heman katê de ruhê pîroz e jî. û ji bo kefareta însanan ya dema ku diwelide bi xwe re tîne bide ji aliyê Xwedê yanî bavê xwe ve ji bo ku bi çarmîxê bê kuştin hatiye şandin. Piştî ku hatiye çarmîxkirin û miriye piştî sê rojan ji nû ve jiyaye. Li gora Mislîmantîyê jî ew kurê Hz Meryema bakîre ye û emre xwedê bêtî ku kes bi Hz Meryem re têkeve têtîkiyeke cinsî hatiye xuluqandin. Berî roja qiyametê ew ê were ser rûyê dinyê û rêbertiyê ji mislianan re bike yanî bibe mesîh⁴⁶

⁴⁴ http://en.wikipedia.org/wiki/Christian_Mithology

⁴⁵ Fuat Aydın, Hristiyanlık, Everest, Sakarya, 2015, r.2

⁴⁶ İbrahim Sarıms, Hz. İsa ve Mesih İnancı, Düşün Yayıncılık, çapa 2, İstanbul 2012. r.39-48

Em li gora kîjan dînê lê binêrin jî Îsa wek hêmanek baweriyê û wek hêmanek mîtolojîk di berhema Hesênê Metê Gotinên Gunehkar de wiha cih girtiye.

“Hîn di wan deman de bi min welê dihat ku Xwedê ez ji bona xwe çekirime. Ez afirandime ku jê hez bikim. Min jî wele kir, heta salen xwe î gehîştinê bi qasî cihûyekê ez jî li Xwedê xwedî derketim, bi qasî mesîhiyekê min jî ji Xwedê hez kir, bi qasî her misilmanekê dema xwe, min jî ji bo Xwedê îbadet kir lê...”⁴⁷

“Qirêja şevê hîn jî bi me ve ye, şilî û soringa şevê li çip û nava ranê Nagînaye hişk bûye û hîn jî sor dixuye, sorekî mîna sorê kefa destê Mesîh pirozwer...”⁴⁸

“li wir, li dibistanê em li ser hemû ol, pêxember û kitebên piroz dixwînin. Ew nav jî ... navê Markûs jî yek ji wan navê hawariyen Mesîh e ku ji wir bi zimane min ve maye. Bêguman cenabê te jî pê dizane ku di kiteba me ye pîroz de jî behsa hezreti Îsa û Meryemê dike. Bi navê Meryem sûreyeke xas, sûreyeke ji nod û heyşt ayetan jî heye. Loma tu jî wek misilmanekê dîlpak û bawermend, xwe aciz neke ku nave mesîhiyekê ji devê min derket, lê ew jî wek ku min got, tenê ji dersên medreseyê bi zimane min ve maye”⁴⁹

“Bi kurtebirî di evî kar û kerametê Xwedê de ez hînî êşê bûm: Ez hîn bûm ku meriv çawa dê û bavê xwe wenda dike, çawa xwenga xwe a mezin wenda dike û xemgîn dibe, çawa narihet dibe û çawa li hemberî pîroziyan ase dibe ... ez wele bum. Ez jî Mesîh şikiyam, ji Xwedê sar bûm.”⁵⁰

“Bi kurti û bi gotineke din ... naveyek ji wan hawariyen Mesîh, wek ku te jî got û tu pê dizanî,

veguhezî navê mîr û mezinekê cinan û li min ma: Mekrûs. Dizanim ku Xwede jê ne razî ye, lê ez ji navê xwe razî me.”⁵¹

⁴⁷ Metê, Gotinên Gunehkar, Peywend, Stenbol, 2013, r. 6

⁴⁸ Metê, h.b., r. 56

⁴⁹ Metê, h.b., r. 56

⁵⁰ Metê, Gotinên Gunehkar, r. 79

⁵¹ Metê, h.b., r. 80

“Me li hev kir. Ji afirandina keç û lawên ademî vir ve, min û cenabê Xwedê, me cara pêşîn li ser tişteki li hev kir. Herweha ne mîna Xwedê, lê mîna yek ji wan keç û lawên ademî Ew daket erdê Galîleyê û li wir ket qalibê Îsayê Meryema Nasirî û bû Mesîh. Di heftê mehê de li Girê Zeytuniyê pêxasên Pilatus ew girtin, dan ber xwe û birin pêş meclîsa Sanderinê. Pontius Pilatus jê xwest ku ew rast bibêje ka ew kî ye, pê da zanîn ku ew dikane Wî bibexşîne ji û ew dikane biryara kuştina Wî jî bide, lewra hezqudretêka wî heye. Lê Ew li wir, di qalibê Mesîh de jî ji a xwe daneket û ji Pilatus re got, ji bir neke.”⁵²

“bi sê rojan piştî van hemû bêyomiyên mala wan, rabûye bi pey min ketiye. Weke wan hawariyên ku li pey Mesîh bigere, Geştina xanim ji bi lingên xwasi bi re û dirban ketiye. Xwestiye min bibîne. O ez jî...”⁵³

“Piştî xwendin û têgêhîştina van hemû tiştên ha gelek carên din jî ew dapîra mamoste Kevanot di nîvê şevan de tê û xwe rayê wî dide, bi wî re dipeyive, li rewşa wî dipirse, mizgîniyên baş an jî gotinên reş jê re bi lêv dike, di her carên weha de tirs û hêrs li mamoste Kevanot tîrtir dibe, di şevê nîvê şevan de ji xewxilmaşîyan divenciye û di her careke weha de jî mîna hezretî Îsa: "Dûr biçe, Seytan!", dibêje û li wê diqîre, lê pere nake, ew dûr naçe, bi vê qêrîna wî re kenekî ji van kenên pîrên cadûkar hişk û zuwa di guhên mamoste Kevanot de olan dide, wê çaxê jî radibe ser xwe, bi hêrs û dengê bilind: "Te dergûşê me jî me girt, keça Seytên!", dibêje, dîwaran pîn û kurmik dike, tufî pencereyê dike, di wê hêrs û tirsê de dîsa dikeve, dîsa dilerize, dîsa zimanê xwe dicû, dîsa av û kef bi devê wî dikeve, dîsa qoçalî ser hev dibe û dikeve.”⁵⁴

2.2.2. Girê Golgotayê

Girê Golgotayê, Li Qudusê girekî ji aliyê baweriya xiristaniyê ve pîroz e. Li gora baweriya Incîlê, Hz Îsa li ser vî gira (navêkî xwe yî din “Girê Hestiyê Serî” ye) hatiye çarmîxkirin û kuştin. Li gora baweriya ew ê xwîna wî têkeve nav axê û dakeva

⁵² Metê, h.b., r. 112

⁵³ Metê, h.b., r.126

⁵⁴ Metê, Labîrenta Cinan, r.146.

heta hestiyê serê Hz Adem û bi vî awayî ew ê Xirîstiyân ji gunehên xwe yê ku dema ku ji diya xwe çêbûne bi wan re ye, xelas bibin.⁵⁵

Vî cihê pîroz di berhema Hesênê Metê Gotinên Gunehkar de wiha cih girtiye;

“Le heta nuha jî kesek û tiştek bi rastiya vê yekê nizane. Ê her weha gotina meclisa Sanderinê pêk hat. Ji diriken dara sincê tacek dan sere Wî, darê xaça Wî lê bar kirin, bi qamçî, bi tif û tinaz dan ber xwe, weke golikekî hajotin û birin. Li ber deriye Êrşalîme, li derveyê diwarên bajer, li meydana Golgotayê di nava du serhişk û îsyankaran de, ew ji mina fêlbaz û gunehkarekî bi xaça darîn ve hat mixkirin. Herkesî û hertiştî ev yeka dît û ev êşa bihîst.”⁵⁶

2.3. MÎTOLOJÎYA ÎRANÊ

Îraniyan di destpêkê de bi neteweya Hîndûyan re tevdigeriyan, B.Z. 1000î ber bi rojava ve koçber bûn û mîtolojiyeke xweser ji xwe re ava kirin. Di warê zanîn, huner û edebiyatê de bi pêş ve dikevin û mîtolojiyek bikok û mayinde derxistin holê. Merev kare çavkaniyên vê mîtolojiyê wiha rêz bike:

Avesta: Avesta wek peyv tê wateya “Metin”.⁵⁷ Pirtûka pîroz ya Zerdeştan e. Mezintirîn çavkaniya mîtolojiya Farisî ye û girîngtirîn beşa wê jî Yeşt e. Di vê beşê de lawa, dia û îlahiyên Îraniyan ji bo xwedayê wan heye.⁵⁸

Dinkert: Ev berhem di dema Pehlewîyan de hatiye nivîsîn, ji deh cildan pêk tê. Li ser baweriya Mezdîsnayê, kitekitên derheqê vî dinî de, adet û nerîtên wan, li ser rîwayet û edebiyata wan agahiyan dide.

Bundehîşn: Bundehîşn yek ji metnên dinê zerdeştîyê ye. Li ser mijarên mîna dîn, afirandina dinyayê, li ser efsane, çîrok û xwezayê agahiyan dide. Di heman katê de pêşî li ber wendabûn û ji halêrabûna gelek efsaneyên mîtolojiya Îranî girtiye.

⁵⁵ Mehmet Alpaslan Küçük, **İkonografiden İnanca “İsa Mesih’in Dirilişi/Paskalya” Süreci**, Gazi Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Hejmara Taybet, Berfanbar, 2016, r.231-234

⁵⁶ Metê, Gotinên Gunehkar, r.113

⁵⁷ Hellmut Ritter, *Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi Karşılaştırmalı Edebiyat Metinleri*, İstanbul, Ayrıntı Yayınları, 2011, r.28

⁵⁸ Nimet Yıldırım, *İran Mitolojisi*, Nûsha, J.7, r.19

Hudayname: Ev çavkanî nav, dîroka xanedanên îranê bi efsaneyan re tevlihev rave dike. Berhemek ji serdema sasaniyan e. Ji ber ku dîrok û efsaneyên Îraniyan vedigêre jî gelekî girîng e.

Şahname: Hudayname ji aliyê şahên Îranê ve tên nivîsandin. Şahname ji Farisiya vê berhemê ye. Ji aliyê diroka neteweyî ya çavkaniyên biqîmet in.⁵⁹

Li gora Mîtolojiya Îranê ewila ewil Hurmuz(Ahûra mazda) di tariyê de û Ehrîmenê di ronohiyê de hebûn. Ahura Mazdayê Xwediyê Zanîna bêserûbînî, hay ji kirinên Ehrîmen yê pêşerojê heye. Ji ber vê yekê Ahuramazdayê dinya afirandî, alem wek “Mînû” afirand ango ruhê ne xwediyê beden. Dema ku Ehrîmen erîş bir ser alemê û afirîndeyan, Ahûra Mazda qenaeta xwe tîne ku pêwîst e afirandin pêk were. Vê afirandina qalkirî divê bi demê re pêk tê, hem afirîndeyên ku Ehrîmen hem jî yên ku Ahuramazda afirandine derdikevin holê.⁶⁰

2.3.1. Behram

Di mîtolojiya farisan de Behram, padîşeyekî ji malbata Sasaniyan e. Bi navê “Bahramî Gûr” tê zanîn. Behramê padîşe ji seyda kerên kûvî pir hez dike. Di farisî de gûr tê wateya kerê kûvî ji ber vê yekê bi navî hatiye bi navkirin. Behramî Gûr bi heqî, wêrekî û bi mêrxasiya xwe nav daye. Di çar salên padîşetîya wî de cihên ku wî lê hukum kiriye, kes nemiriye. Li gora rîwayetê rojekê dema ku li seyda karên koviye li dû seyda xwe dihere, di bîrekê de werdibe û dimire.

Behram tenê ne navê vî padîşeyê mêrxas e. Di mîtolojiya Farisan de. Navê melayketekî ye jî. Peywîra vî melayketî parastina mêvan û rêwîyan e. Ji ber ku ji roja bîstemîn ya meha rojê re dibêjin Behram, qedandina kar û barên wê roja jî di nav peywîrên vî melayketî de ne.

⁵⁹Yıldırım, h.b., r24

⁶⁰ Someyah Easy, İran ve Türk Mitolojisiinde Ay ve Güneş ile alakalı Tacavurlar, Yüksek lisans Tezi, İzmir, 2010, r.90

Navê stêrka merih jî wek Behram tê qebûlkirin. Şîrazî di *Dîwana Hafîz* jî bo Behram vana dibêje: “ji ber ku Behram yezdanê şer e dema ku şair navê wî bi lêv dikin, peyvên vê têkiliya dihevin bi kar tînin û li gora elfaza cemiyetê tevdigerin.”⁶¹

Metê Di pirtûka Gotinên Gunehkar de Nevê ji yek serlehangên xwe wek Behram tercîh kiriye. Behram Xwendekarê Îlahiyatê ye û li gundê Xwediyê xwe yê malê mêvan e. Dil dide qîza wî Nagînayê (Demora) Nagîna ji ber ku wek periyek avê tê sêwirandin û ji ber ku Behram jî di pirtûkê de (dema ku dikeve û ji ser xwe dihere) dikeve rêwîtiya lêgerîna Nagînayê. Wek ku me li jorê jî diyar kiriye navê Melayketê ku mêvan û rêwiya diparêze Behram e. Lê Metê di vê pirtûkê de Behram ne wek parêzer wek mêvan û rêwiyekî di lêgerîna evînê de bi cih kiriye.

“Ezbenî, dibêjim, ez nizamim ji kuderê dest pê bikim... ez çîrokê dirêj nekim û pê serê cenabê te neyêşînim... ji tîbûna xwe dest pê bikim: ez tî bûm, min daxwaza avekê li Nagînayê kir... Nagîna keça xwediyê xaniyê min e, lê ez hîn bûm ku li van deran bi navê Demorayê nas e... Demorayê da pêşiya min û em ketin rê... em li avê digeriyan. Min û wê me bi hev re gelek rê kudand û em hev re hatin. Le li derekê min û wê me hevdu wenda kir... an jî tenê min ew wenda kir... dûre rastî Mekrûs efendî hatim... Mekrûs efendî kalê wê ye... Di tevahiya vê rê û vê garê de gelek tişt, tiştên ku min xwest ez bizanim û pê serwest bibim, Mekrûs Efendî ji min re negot. Lê wî rişma hespekî reş î mîna teniyê da dest min û got: “Ku te bivî tu rastiye bizanî, bide ser vê rêyê... Rêya zanîna rastiye ev e. Heta ku tu digihêjî cîhê xwe, xw jê nede alî.” Min jî welê kir. Min xwe ji rê neda alî û heta vir hatim. Ku em wî hespê reş î mîna teniyê jî nebêjin heta vir ez bi tena serê xwe hatim... ku xwe bibêjim, ez behramê Kawaşî... xwendekarê medreseya îlmê îlahî me.”⁶²

Behramê di mîtolojiya farisan de wek padîşeyekî cih girtiye, ji aliyê Metê ve wek melayketê mêvan û rêwiyan bîne bîra merev fiksiyona xwe ava kiriye. Heger merev wek padîşeyê şer lê binêre xîret û têkoşîna wî ya di warê dîtina Geştinayê de şerekî ne xerab e ji bo bibe mînak.

⁶¹ Dursun Ali Tökel, *Divan Şiirinde Mitolojik Unsurlar*, Ankara, Akçağ Yayınları, r. 119.

⁶² Metê, *Gotinên Gunehkar*, r.92

2.3.2. Ahura Mazda

Mezintirîn yezdanê Mîtolojiya Farisan Ahûra Mazda, Yezdanê Zanînê ye. Di mîtolojiya farisan de wek afirînerê gerdûnê tê dîtin. Ew afirînerê xwediyê du ruhên bi navên Spenta-Mainyu û Angra-Mainyu ye. Spanta Mainyu, ronahî, rastiya jiyanê sembolîze dike. Angra-Mainyu jî ruhekî xerab e. Ahura Mazda ji ber ku hemû tevgerên mirovan dişopîne û qet ranakeve di mîtolojiyê de wek ku yezdan nikare bê xapandin tê zanîn. Yezdana mezin ya eşqê Mithra û Yezdana eşq û bereketê Anahita û Ahura Mazda bi hev re wek “Yezdanên Sêmend” tên bi navkirin.

Ahura Mazda di pirtûka Gotinên Gunehkar ya Hesên Metê de Ewîl wek mîrê Mezin paşê wek Ahura Mazda û cardin heman karakter wek Şeytên di heman cihê de dikare bê bi navkirin. Di vir de ji meseleya afirandina Adem û Hewa heta qewirandina Şeytan ya ji hizûra Xwedê bi gelek tiştan dizane û qal dike. Bi aliyê xwe yê zana ve merev kare wek aliyekî hevbeş yê Ahura Mazdayê di mîtolojiya Farisan de bixwîne.

Metê, di Gotinên Gunehkar de, bi daxwaza Behramê serleheng re zanebûna Ahûra Mazda di çîroksaziya xwe de çawa li hev aniye binêrin:

“Heta nuha jî mijara teolojiyê bi qasî îro bala mamoste Kevanot nekişandiye, weke gelek kesan wî jî hebûna hêzeke bi navê yezdanê dilovan, bi navê Xwedê di dereke serê xwe de bi cîh kiriye, di felsefeya ola Zerdeştî de başiya Ahûra Mazda û xirabiya Angra Manyû bihîstiye, bihîstiye ku Bûda di şîretên xwe de ji şagirtên xwe re: "Hûn bixwe ji xwe re bibine ronahî." gotiye, ji nêzîk ve dîtiye ku bi hezaran, bi mîlyonan merivan dane ser rêya ola mesîhî, di rûpelên rojane de weke bûyerên rojê şer û kuştinên ji bo ol û pêxemberê herî dawîn xwendiyê û hew.”⁶³

2.4. MÎTOLOJIYA KURDAN

Kurd û Faris bi salan cîrantiya hev kirine, di coxrafyayek hevpar de di nav çandên nêzîkî hevdu de mezin bûne û her weha karîgerî li hev kirine. Ê her du gel jî wek kok arî ne. Vecdi Demir di teza xwe ya masterê de ji bo esl û koka arîbûna Kurdan wiha dibêje, “Kurd di eslê xwe de ji nijadeke arî tên. Xelîl Xeyalî, destana Kawa ya

⁶³ Metê, Labîrenta Cinan, r.144

ku di Şerefnameyê de derbas dibe, di kovara Jînê de, bi awayekî neteweperwerî şîrove kiriye û parastîye ku Kurd bi eslê xwe Îranîyên heqîqî ne. Li gorî Xeyalî, B. Z. di navbera salên 3000 û 2400'î de bi cihbûna hewzeyaya Ferat û Dîjleyê ya Ariyan, Kurd derketina ser sahneya dîrokê û bi damezrandina Împeratoriya Medan ve berdewamiya nijada xwe kirine.”⁶⁴

Gelek hêmanên mîtolojîk di navbera gelê fars û kurdan de hevpar in ku merev wek mînak behsa mîtên Gîlgemêş, Newroz, Kawayê hesinkar û hwd bike. Çawa dîrok û mîtolojiya arî li ser civak û berhemên farisan karîgerî kirine, bi heman awayî li ser kurdan û berhemên Kurdî jî kirine.

“Mît di çanda Îranê de xwedî roleke pir girîng e û heke mirov di eynika dîrokê de li van mît û ostûreyan binêre, fêmkirina wan dê hêsantir be. Ji bo vê yekê jî wextê ku em behsa Îrana kevin dikin, divê em bizanibin ku Împaratoriya Îranê coxrafyayeke berfireh ji Asyaya Navîn digre ber xwe û ji Îrana îroyîn pir berfirehtir û mezintir e û gelek carana axa kurdan jî beşek ji vê coxrafyayê bûye. Di nav dîroka Împaratoriya Îranê de gelek bûyerên cur bi cur qewimîne ku di nav gelên Rojhilata Navîn bigre heta di hemû cîhanê de deng vedane. Herwiha ev coxrafyaya berfireh xwedî mîtên cûr bi cûr û balkêş e û ji ber vê yekê jî beşeke herî girîng ji mîtolojiya cîhanê, mîtolojiya Îranê ye.”⁶⁵

2.4.1. Destana Memê Alan (Mem û Zîn)

Di warê mîtolojiya Kurdî de destana Memê Alan cihekî gelekî girîng digire. Kurd ji ber ku gelek dîn guhertine û wek netewe jî roja îro di nav wan de ji Xiristiyantiyê heta Yarsaniyê ji Êzdiyatiyê heta Misilmantiyê ji gelek dînan bawer dikin, û ji ber di dîroka xwe ya nêz de nebûne xwedî erkek bi rêkûpêk çanda wan ya devkî ji ya nivîskî xurtir e. Destana Memê Alan bi gelek guhertoyan li gelek der û bajaran kurdan di nav gel de tê zanîn. Ehmedê Xanî ji di sedsala 17 emîn de ji ber vê

⁶⁴ Vecdi Demir, *Kurdên Arî: Mît, Dîrok û Îdeolojî*, Artuklu Ünîversîtesî, Mardîn, Lîsansa Teza Bilind, 2019, r.15

⁶⁵ Morad Berouki Milan, *Teza Lîsansa Bilind, Hêmanên Îranî Yên Dîrokê û Mîtolojîk Di Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Diwana Melayê Cizîrî De*, Artuklu Ünîversîtesî, Mardîn, Lîsansa Teza Bilind, 2019, r. 2

destana evînî mesnewiyek bi navê Mem û Zîn nivîsandiye. Ji wê dema heta nuha wek şanone wek pirtûk gelek caran ji edebiyatê re bû mijar û di pirtûkan de cih girt. Vecdi Demir di teza xwe de wiha qala vê yekê dike:

“Herçiqas buyersazî balkêş be jî ku bi kurtasî em naverokê bixwînin, vegotineke ku li her terefê dinyê minakên bi vî rengî hene, em dê bibînin. Di çîrokê de, evîneke sêkoşeyî bala xwîner dikişîne. Mem û Zîn, du dildarên ku ji hev hez dikin. Lehengê nebaşiyê Beko Ewan dixwaze pêşiya vê evînê bigire û bi dek û dolaban Mem dide kuştin. Zînê li ser gora Mem, ji êşa evînê dimre û li kêleka heman gorê tê veşartin. Beko piştî van bûyeran diçe xwe di nava her du goran de vedişêre. Ew jî tê kuştin û xwîna wî diherike binê gorên wan da ku her duyan ji hevdu biqetîne. Piştî jî vê xwînê striyek peyda dibe da ku heta ebedê cudahiya Mem û Zînê berdewam bibe.”⁶⁶

Wek ku me li jor jî gotî, Metê di pirtûka xwe Tofan de Beko Ewan ji mezelango ji xewa ebedî radike û cardin li Cizîrê digerrîne û li civakê guhdarî dike.

“Li vir, li ser banê xaniyê sofî Merwan heta ku em şîv û paşîva xwe ji dixwin, ew her ji min re bi kêf û bi xweşî çêlî cenabê Ahmedê Xanî dike, ji devê Mem û Zîna wî beyt û qesîdeyan bi deng dike, carina jî ji hedîsdaran kerametên cenabê wî bi lev dike û dibaje.”⁶⁷

Di cihekî din yê heman pirtûkê de jî wiha qal dike;

Di vê tarî û ve ronahiyê de min gelek tişt dîtî û min gelek tişt bihîstin, ya arif. Ji katibiya cenabe te û ji devê xelkê, min guhdariya çiroka xwe û wan evindaran kir. Min guhdariya Mem û Zîna evindar kir û ez serwextî meziniya te bûm. Qedir û meziniya cenabê te li ser ser û herdu çavên min, le..⁶⁸

Li dereke din de jî wiha ye;

⁶⁶Vecdi Demir, *Kurdên Arî: Mît, Dîrok û Îdeolojî*, Artuklu Üniversitesi, Mardin, Lîsansa Teza Bilind, 2019, r.38

⁶⁷Metê, Tofan, r. 10

⁶⁸Metê, h.b., r. 26

- De were safî bike, ling bi ling diçe ber sing. Diyar e Mem û Zîna cenabê ruhê pak û kitêba wî baş li te kêr kiriye, anuha têdigêhîjim bê tesîreke çiqas xurt li te kiriye.⁶⁹

2.4.2. Bekoyê Ewan

Bekoyê Ewan karakterê astengker yê destana Memê Alan e. Bekoyê Ewan ewqasî di nava civakê de cîh girtiye ku êdî di nav gel de peyv û gotinên wek: “Beko Ewantiyan nekin/ neke!, Tu mîna Bekoyê Ewan dikevî navbera me.. û hwd.”⁷⁰ tîn bihîstin û gotin. Helbet ji aliyê mîtolojîk ve qisse û tiştên ku li ser evîndariyê tê gotin de dema ku yekî ku naxwaze mirazê yê ji hev hez dikin bi cîh were mînaka Bekoyê Ewan tê dayîn û ew kes bi wî re tê şibandin.

Metê di pirtûka Tofan qala ji nû ve jînbûna Bekoyê Ewan dike, û çîroksaziya pirtûka xwe jî li ser vê yekê saz dike. Ji dema ku destan lê qewimiyê heta roja îroyîn kronolojiyekê çêdike û carinan jî dide ber hev.

Di pirtûkê de li cihekî wisa dibêje:

Ne maqûl e ... ne tişteki maqûl e ku tu wî navî li xwe datîni. Lewra diviya bû te jî êdî pê bizaniya ku ... kar û kirasê Bekoyê Ewan, navê wî, ne tişteki welê pak û paqij e ku tu bi xwe ve dizeliqîni.⁷¹

“ - Ev der jî gorna Beko ye ... dibêjin, rîwayet dibêje gorna Bekoye Ewan e. Le bi vî navê Bekê re zîq li hundurê çaven min dinêhire. Di we gavê de ew tiş û ew çala ha, ew xweliya teze min ber bi xwe ve dikêşe.”⁷²

“ -Min fam kir bê tu kî û ji kê yî, Delyan. Ji xwe hevalan ji min re behs kiribûn. Lê ev hevalên vir jî baş pê dizanin ku xweliya Cizîra Botan li ser ser û herdu çaven me, teberika hêza me ye. A ev kesên li vir, hemû jî ji berhem û bereketa vê teberika me ne. Lê divê meriv tişteki ji bir neke ... ji bîr neke ku Bekoyê Ewan jî mîna te ji bizrê vî erdî bû û ew jî Cizîra Botan derket.”⁷³

⁶⁹Metê, h.b.,r. 35

⁷⁰ Ji Fatma Hecî Şêxmûs hatiye berhevkirin li herêma Mêrdînê.

⁷¹ Metê, Tofan, r. 35

⁷²Metê, h.b. r. 41

⁷³Metê, Tofan, r. 55

“Bekoyê Ewan evê rîwayeta xwe diqedîne. Bi van gotinen xwe re bi marîfet di ser kela gorna eziz de xwar dibe û maç dike, dûre dîsa bi qasî sê buhustan jê vedikişe, dîsa bi çog herdu destan diçe erdê, dîsa herdu destên xwe di enî û pişta herdu çavên xwe re dide, dîsa radibe û herdu destên xwe li ser navika xwe girêdide û dîsa hustuye wî di ser sîngê wî de xwar e. Bekoye Ewan berepaş ji wir vedikişe û di quncike aliyê jer de wenda dibe.”⁷⁴

2.5. MÎTOLOJIYA ÎSLAMÊ

Her çiqasî hê jî li ser nîqaş hebin jî, Mîtolojiya Îslamê, wek beşek mîtolojiyê ku mijar têgehên li ser dînê Îslamê û vegotinên bi îslamê ve girêdayî disekine tê qebûl kirin. Çavkaniya van vegotin û têgehên ne tenê bi Qur'anê ve sînorkirî ye. Çavkaniyên mîna Îsrailiyat û Kabala yên xiristiyantî û mûsewîtiyê, pirtûkên van dînên Îlahî û baweriyên civakên berê ne misilman bûn nerît û kevneşopiyên wan wek çavkanî ev beşa mîtolojiyê dewlemend kirine. Di nêrîna kevneşopîk de mîtolojiya yahûdîtiyê wek çavkaniya mîtolojiya îslamê dihat dîtin. Lê piştî ku hat famkirin ku ev nêrîn bi berfirehî vê beşa mîtolojiyê nahundirîne, bi pêşketina têgihîştina zanîne û bi pêş ve çûna antropolojiyê re hatine merhalleyê ku ji bo her mîtolojiyê yek bi yek çavkanî bîn diyarkirin. Di vê çarçoveyê de çavkaniyên mîtolojiya Îslamê jî bi pêş ketiye.⁷⁵

Çavkaniyên Mîtolojiya Îslamê karin wiha bîn rêzkirin:

- Çavkaniyên dînî: Kitêba Muqeddes Qur'ana Kerîm, tesfîr, hedîs û şerhên hedîsan.
- Çavkaniyên tesawifî: Berhemên klasîk yên tesawifî, kitêbên tabakatê, teziretu'l evliya, Manakipnameyên tesawifî,
- Vekayinameyên tesawifî, klasîkên tesawifî; tarîxa îslamê, berhemên Cogrfayayê, tarîxa bajaran,

⁷⁴ Metê, Tofan, r.55

⁷⁵ <http://tr.wikipedia.org/wiki/İslam> mitolojisi

- Kîsasû'l Enbiya, Sîretu'n –Nebî; berhemên ku jiyana pêxemberan bi awayekî dastanî vedibêjin
- Çavkaniyên Edebî; romanên dastanî, dîwan û çîrokên dînî,
- Çavkaniyên îkonografîk; Sêwirandinên dîtbarî yên derbarê çanda şîî, Bektaşî û alewîdîtiyê.⁷⁶

Ewil li rojhilata Navîn paşê bi rêya cîrantiyê re bawerî û mîten Hind, Faris, Anatolya, Misir, û hemû derên cografîk ku dîne heq Îslamiyet lê belav bûne bi hin adaptasyonan îslamîze bûne û ev yek gelekî normal e. Bi vî aliyê xwe hin baweriyên di nav Mîtolojiya Îslamê de; Bawerî, Mîtosa afirîşê (xuluqandinê), kes, civak mîtosa tirsê, navê deran, heyberên rûhanî, obje, bûyer, tilsim, û diayên bi vî rengî mijarên sereke ne. Mijarên Mîtolojîk tevî ku karin bi îslamiyetê ve girêdayî bin karin ji mîten ku ji aliyê civaka îslamî ve ji nû ve hatinê şîrovekirin jî pêk werin. Mîtosên di nav mîtolojiya Îslamî de cih girtina bi piranî bi kesan ve girêdayî ye. Mesala Adem, Hewwa, Nûh, Silêman, Belkis, Hîzir, Îlyas, Îdrîs, Şît, Lokman, Evliya, Zulkarneyn, Hecûc û Mecûc, Eshab-i Keyf, Mêhdî, Mesîh, Deccal, Dabbe, Ebabîl; ji bilî van mîtosan Harût û Marût, ruh, Malik, Melayket, cin, Ifrît, Zebanî, Iblîs, Şeytan, Hûrî, u hwd. ji bilî van di çanda Alewî û Bektaşîyan de Mîten li ser Elî, Fatma û 12 îmaman jî kare lê bê zêde kirin. Lê wek mînak mîtosên tirsê di Mîtolojiya Îslamê de gelekî balkêş e. Helaqa qewman, Tufan, Axir Zeman, Ezabê Cehenemê, Ezabê Qebrê.⁷⁷

2.5.1. Hz.Adem

Dema ku Hz Adem û pêxemberên din yê hebûna wan ji aliyê dînen semawî ve tên qebûlkirin, di mîtolojiyê de bîrên şîrove kirin, bila neyê wê maneya ku em hebûn û nebûna wan dinirxînin an jî wek pêxemberên heq qebûl nakin. Bereksî vê yekê em dixwazin mît û efsaneyên li ser van şexsiyet û rêberên civakan destnîşan bikin.

Hz Adem yekem pêxember e. Û li gora Qur'anê yekem însanê ser rûyê erdê ye. Axa ku Hz. Adem jê hatiye xuluqandin ji hin materyalan pêk tê. Ewil ax, herî, mezeloq, çirav, heriya hişkbûyî û heriya şekil hatiye dayîn. Di vê pêvajoyê de ya herî

⁷⁶<http://tr.wikipedia.org/wiki/İslam> mitolojisi

⁷⁷<http://tr.wikipedia.org/wiki/İslam> mitolojisi

girîng ev e ku ev hemû kar û bar bi yezdanî hatine kirin. Li gora hedîsan Hz Adem roja îne hatiye xuluqandin. Axa ku pê hatiye afirandin ji dinyê ji aliyê Azraîl ve hatiye sitendin. Xwedê Teala ewil Cebraîl şandiye ji bo anîna axê, piştî ku ew dest vala vegeyriyaye Mîkaîl şandiye, dema ku ew jî dest vala vegeyriyaye Ezraîl şandiye, wî ji ser rûyê dinê ji rengên ji hev cuda û ji cihên cuda ax berhev kiriye û aniye. Axa ku ji aliyê Ezraîl ve hatiye anîn tê şilkirin, tê meyandin, çel salî tê sekinandin. Piştî ku ev herî dikeve forma însanan, ruh tê pîfkirin. Ruh ji serî wî dekeve laşê wî û cihê ku tê re derbas dibe, dibe goşt. Piştî ku ruh dikeve laşê Hz Adem hemû melayiket jê re secde dikin lê tenê Şeytan direve û jê re secde nake. Xwedê şeytan diqewirîne lê bi şertê ku tenê ew ê dest darekê nedin Hz. Adem û xanima wî Hz. Hewa ew ê karibin li cenetê bimînin. Hz Adem li cenetê aciz bûye. Li ser vê yekê ji Xwedê lawa kiriye. Xwedê dema ku Hz Adem di xew de ye jinek pir xwşik rê wî da ye, dema ku şiyar bûye jî wê li ber serê xwe dîtiye. Hz Adem piştî xuluqandinê jiyan bi piranî li cenetê derbas kiriye. Ew û xanima xwe li wir hatine bi cih kirin. Emrê Hz. Adem li gora dema dinyayê 250 sal, li gora ya axiretê jî du-sê saet e. Şeytên ji bo Hz Adem û Hz. Hewa hetahetayê di cenetê de nemînin ew xapandiye û sêva qedexê bi wan daye xwarin û ew gunehkar kirine. Dema ku ji vê sêvê xwarine, derê wan yê edebê xuya bûye mecbûr mane ku wan derên xwe yê edebê veşêrin. Herdu jî bi şaşiya xwe haydar bûne û hesta fedikîrîne bi wan re çêbûye, û hînî tobekirîne bûne. Ev tiştên ku me li ser Hz Adem gotin li gora hin lêkolîneran di heman katê de isriliyat e jî.⁷⁸

Hz Adem, Benî Adem, Ademî ev nav û navlêkirîne ku însanan qest dikin di nava jiyan rojane ya mirovan de gelekî cih digirin. Me bi kurtasî qala çîroka Hz. Adem kir. Nivîskarê me Metê di gelek deran de qala Hz. Adem kiriye em ê bi çend mînakên şênber bikin;

Di pirtûka Tofan de;

“Li wir, li ser wî girî ez li hawurdor dinêhirim û her tişt bi min xerîb e. Ji bo ku baştir bibînim, ez bi nermikan destan çavên xwe mist didim lê bîr û têngêhîştîna tişteki

⁷⁸ Dursun Ali Tökel, Divan şiirinde Mitolojik unsurlar-Şahıslar Mitolojisi, Akçağ Yayınları, Ankara, 2000 r. 273.

li min peyda nabe, ya arif. Mîna yekî ku şev lê bigere ez xwe didim erdê û rûdinim. Li erdê hedî hêdî ramanekê ademî li min eyan dibe.”

Cardin i pirtûka Labîrenta Cinan de;

“A ji wê wextê û vir ve ye ku ev aferîdên ha xwe dane aliyê qayîşkêşê Xwedê, Şeytanê Mezin, bi giyan û mejiyê ademîyan ketine, derewan li hev tînin, tovên nebaşiyê di nava merivan de direşînin, merivan berdidin pêşîrên hev û ji ser riya reast didin alî.”⁷⁹

Cardin di pirtûka Gotinên Gunehkar de li cihekî Mîrê Mezin, qala diyakogek xwe û Xwedê dike;

“Xwedê got : “Ez ê anuha jî tiştêkî din biafirînim.”

Min got: “Tu ê çi biafirîni?”

Xwedê got: “Ez ê di sûretê xwe de ji axê Ademêkî biafirînim.”

Min got: “Ji bona çi?”

Xwedê got: “Ji bona xwe.”

Min dengê xwe nekir. Min da xatirê maziniya wî û herweha ji axê ademêkî xwe afirand. Û dûre, piştî gelek wextan rojekê hat û dîsa got: Y’Ahriman!

Min dizanîbû ku dîsa ji ber kar kerematekî xwe kêfxweş bûye, ez ji ber rabûm û min gotê: Kerem bike ez bi gorî.

Xwedê got: “Anuha jî ez ê hewayekê biafirînim.”Min got: “Ew ji bo çi?”

Xwedê got: Ewê jî ji bona xwe. Ew jî ji bona min e. Dixwazim Hewa Xanim xwe bide kêleka Adem, ji hev hez bikin û tev keç û lawên xwe, ew van hemû kar û kerametên min bibînin.”⁸⁰

⁷⁹ Metê, Labîrenta cînan, r.146

⁸⁰ Metê, Gotinên Gunehkar, r. 97,98

“Li wir, li ser wî girî ez li hawurdor dinêhirim û her tişt bi min xerîb e. Ji bo ku baştir bibînim, ez bi nermikan destan çavên xwe mist didim lê bîr û tîgêhîştîna tiştêkî li min peyda nabe, ya arif. Mîna yekî ku şev lê bigere ez xwe didim erdê û rûdinim. Li erdê hedî hêdî ramaneke ademî li min eyan dibe û zelaliyek li ber çavên min vedibe. Lê di rewşa hawurdor de hîn jî çu zelalî tune. Bajar e, gund e ez ji hev dernaxim. Li jora vî girê ha destên min li ber rûyê min, bi awurên bej û biyanî ez li avahiya xaniyan, li raxistina kuçeyan dinêhirim û dikim ku bînim bîra xwe ka ji caran careke min cîhekî welê dîtiye an ne. Lê ji bilî av û çemê mîrekiya me, tiştêkî van deran bi min nade zanîn ku ev der ji erdekî malê ye, ya arif. Di wê gavê de xewa Eshabeyên Kehf dikeve bîra min û ez jî ji vê rewşa xwe dikevim gumanekê. Dudiliyek peyda dibe û ez dixwazim ji ser gir bi şûn de vegerim cîhê berê. Ê ez welê dikim.”

2.5.2. Hâbil û Kabil (Kaîn û Abel)

Xwîna ewil ya ji aliyê mirovan ve hatiye rijandin bi gotineke din Qisseya Hâbil û Kabil di Qur'anê de û di Kitêba Muqaddes de mijarek hevpar e.⁸¹ Ev qisse wek fikra esasî û mijar di Mîtolojiya Sumerî de heye. Berî ku em qala çîroka herdu kurên Ademî bikin divê em bêjin ku ev herdu nav wek peyv di Qur'anê de derbas nabin.

“Ji ber vê tevgera xwe ya gunehkar, ji xwe bêtir ez ji Xwedê hêrs dibim. Ez ji Xwedê narihet dibim ku çima dihêle ez hîn jî bijîm, bijîm û gunehkariyan li xwe zedetir bikim, zedetir şerm bikim. Xwedê dizane loma êdî ez ne bi gotina Xwedê, lê ez sond dixwim û sozê didime xwe ku bi a xwe bikim. Ez bi a xwe dikim. Mina ku tobe bikim, sicde bikim, tewaf bikim ... di ber xwe de hedîka xwarî erde dibim, destê xwe li axê, li erdê dipelînim. Baş pê nizamim ka bê çî bi dest min dikeve, le bi wî tiştî heta ku ji min tê bi pît û pêt li eniya xwe dixim. Dixwazim xwe bikujim. Ez wusa dikim. Çaven min girtî ne, peşiyê tarî û dûre jî ronahiyeke soravî li pêş çavên min en girtî fereh dibe. Di cih de rûdinim an jî ez nikanim li ser lingên xwe rawestim û didewixim erdê. Erdê çolekê ye, rasterast erde çoleke hişk û biring e ku eniya min dispêre axa xwe. Ez hîs dikim ku eniya min li axê ye, ez hîs dikim ku ji dema şere Kain û Abel vir ve cara

⁸¹ Mustafa Öztürk, Kur'an, Kitab-ı Mukaddes ve Sümer Mitolojisiinde Hâbil-Kabil Kıssası, Ç.Ü.İlahiyat Fakültesi Dergisi, Cild 4. J. 1, 2004, r.2

peşîne ku bîhn û tîna axeke bi xwîn çawa ye. Tîn û bîhna axeke bi xwîn li eniya min dide der û ez tî dibim.”⁸²

- Min ev hemî tişt mîna îmtiyazekê dan Xwedê. ... dibe ku keç û lawên ademiyan bawer nekin, lê Bayê Dawîn şahidê me ye. Dema ku em, ez û Xwedê, em li vir li ser vî tiştî peyivîn û me li hev kir, an jî me li hev nekir. ... a wê çaxê Bayê Dawîn jî li dora me çerx dibû. Rabûm min ew Bayê Dawîn jî kir Şikefta Bakur û ji wê rojê û vir ve her li wir e ... Roja Dawîn, ez ê deriyê wê Şikefta Bakur vekim û wî Bayê Dawîn berdim rûye dunyayê. A wê çaxê herkes û hertişt ê baştir û rastir bi çiroka min û cenabê Xwedê bizane. Hîn di wê dema pêşîn de jî min rastî vegot, min rastî vekir û min rastî da zanîn ... bi gotineke din, min rastî veneşart û nenixumand, min sînor û çeper li ber nefis û daxwaza kesekî û tişteki daneçikand. Çîrok ev e, rasti ev e. Ê we roja ku bi kevirê Kaîn re çilka xwina pêşîn li erdê ket, min dizanibû ku êdî paqij nabe, min dizanibû ku dawî li vê herika xwinê nayê ... û hîn di wê rojê de ev hemû gotin û ramanên min jî rast derketin. Rast derketin ku êdî şer, kuştin, êş, xezeb û tofan jî li dû ne. Ê welê jî bû, weke min bû. Piştî wê çilka xwina serê Abel, êdî keç û lawên ademî bi hev ketin, bi xwînê ketin, bi mirinê ketin, bi êş û nexweşiye ketin, bi çîrok û derewan ketin ... Keç û lawên ademî bi vê yekê jiyan, bi vê yekê dijîn û ew ê her bi vê yekê jî bijîn.”⁸³

2.5.3. Eshab-î Kehf

Eshab- î Kehf di çanda Îslamiyet û di ya Xirîstiyaniyê de ji nû ve hatiye avakirin, di nav civakan de hebûna xwe wek heft kesên di xew de/ Eshab-î Kehf berdewam kiriye. Piranî wek delîlek jiyanî piştî mirinê hatiye dîtin û hezkirin. Li gora vê yekê ew ê Xweda di demên dijwar û zahmet de bi rêya xewê bîparêze.

Li gora baweriya Xiristiyaniyê efsaneya Eshab-î Kehf dema ku Xiristiyantî li Anatoliyayê dest bi belavbûnê kiriye derketiye holê. Hukumdarên Romyayê ji ber ku hîn Xiristiyantî wê demê nebûye dîne fermî gelek zulm li Xiristiyanan dikirin. Eshab – î kehî jî yek ji van çîrokan e ku qala zilma hukumdaran dike. hukumdarê ku di

⁸² Metê, Gotinên Gunehkar, r.55

⁸³ Metê, Gotinên Gunehkar, r.109

efsaneyê de zilimkar Decius e. Eshab –î Kehfên ku wek şehîd tên bi navkirin di dêr, kitêbên diayan de gelekî tên bi navkirin.⁸⁴

Eshab –î Kehf li di çanda îslamiyetê de li gora ya xiristiyanîyê berbelavtir e, bêtir tê nasîn û zindîbûna xwe bêtir diparêze. Sedema vê yekê di kuarnê de cihgirtina wê ya Qur'anê ye. 18. Sûreya Qur'anê ya bi navê Kehf û ayetên wê yên di navbera 9-16'an bi vê qissayê ve girêdayî ye.⁸⁵

Helbet qissayek ku ew qasî di nav civakên cuda de cih girtî ji Mewlana heta Firdewsî bûye keresteya gelek metnên edebî. Metê jî di pirtûka Tofan de wiha qal dike.

Metê di vê berhema xwe de yek ji serlehengên destana Mem û Zînê Beko Ewan ji xewa wî şiyar dike û wî li cardin li ew der û dorên kû destan lê qewimiye li nav mirovan û di nav civat û çanda ku hatiye guhertin digêrîne. Ji aliyê Mîtolojîk ve wek çîrokeke fantastîk jî Qsseyaya Eshab –î keyf ji aliyê Metê ve li temamê berhemê hatiye belavkirin. Jêgirtina ku me li jorê ji pirtûkê kiriye bi tena serê xwe kare bibe mîna keke şênber ku ev hêmana mîtolojîk ya baweriyên Îslam û Xirisiyantiyê ji aliyê Metê ve hatiye bikaranîn.

2.5.4. Tofan

Di mîtolojiyê de tofan di heman katê de hem jiyanê hem jî mirinê sembolîze dike. Mirov ji avê hatin afirandin û bi tofanê re ji bo ku av jiyana ku nuh ava bike ya kevin bi rengî ango bi tofanê re ji holê radike. Bi vê yekê re dezgehek ku ji aliyê avê ve tê birêvebirin derdikeve holê. Civakên ku bi ya şîretên pêxemberên afirînerê xwe nakin, bi marîfeta tofanê, ji aliyê afirînerê xwe ve tên tunekirin.

Li gora baweriya gelek çandan ji tofanê tenê kesek an jî çend kesên jimartî xelas dibe. Û mirovahî ji vî kes an kesên ku ji tofanê xelas bûne zêde dibin. Wek mînak li Meksîka û Awisturalyayê Hîv ji mirovan aciz dibe û tofanê radike. Piştî tofanê ji nû ve jîn an jî cîhaneke nuh derdikeve holê.⁸⁶

⁸⁴ Özlem, Sert, Umudun Tarihine Yolculuk Yedi Uyurlar Efsanesi, Phoenix Yay., Ankara 2009 r. 29

⁸⁵ Sert, 2009 r. 176

⁸⁶ Firat Caner, Büyük Tufan Mitleri ve Atra- Hasis, Karadeniz Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, 2017, j.3, r.17

“Çîrok ev e, rasti ev e. Û wê roja ku bi kevîrê Kaîn re çilka xwina pêşîn li erdê ket, min dizanibû ku êdî paqij nabe, min dizanibû ku dawî li vê herika xwinê nayê ... û hîn di wê rojê de ev hemû gotin û ramanên min jî rast derketin. Rast derketin ku êdî şer, kuştin, êş, xezeb û tofan jî li dû ne. Û welê jî bû, weke min bû. Piştî wê çilka xwina serê Abel, êdî keç û lawên Ademî bi hev ketin, bi xwînê ketin, bi mirinê ketin, bi êş û nexweşîye ketin, bi çîrok û derewan ketin ... Keç û lawên ademî bi vê yekê jiyan, bi vê yekê dijîn û ew ê her bi vê yekê jî bijîn”⁸⁷

“Li wir kesekî ji me jî bavo nepirsî ka ew ê bi kuderê ve biçê. Le ez bawer dikim ji bilî min hemûyan jî bi we tofane, bi we xezebe dizanibun. Dixwazim bibejim daye ji û Miraye ji... wan pê dizanîbun. Loma nepirsin. Bavo xwe nezi Miraye kir, ew bi hemeza xwe ve şidand û em hemû heta ber deriyê hewşê pê re çûn. Şeveke reş, tarî û mîna teniyê bû. Bavo deriyê hewşê vekir, di devê derî de vegehiya ser dayê ii: - Bundan sonraki tufan nedir bilir misin, azizem .. : got, derket, di kuçeye de bû parçeyek ji tariya şevê û wenda bû.”⁸⁸

Hesenê Metê di pirtûka Tofan de meseleya tofanê bêtir ku qala Nûh bike di ser karakterê nebaş yê astengker yê destana Memê Alan Bekoyê Ewan re, bi marîfeta piştî hezar salan wî jî xewa mirinê rake û li nav civaka nû bigerîne li gora tevn û çîroksaziya pirtûka xwe bi kar tîne. Ew belkî tofanekê ranake lê jî nû ve jînkirina Bekoyê Ewan re bi awayekî tofan an jî nebaşiyên ku bi serê kurdan ve hatine bi axaftina karakterên xwe re bi çîroksaziyek mîtokllojk neqilî xwînerên xwe dike.

“Lê Sofî Temir ranabe ser xwe, bûye benîşt û bi erdê ve zeliqîye. Eniya xwe daye axa sar, bi girî, bi gunehkarî lava dike û dibêje:

- Ez çî gunehkarekî mezin im, Xwedêyo em. ... em xelkê Botan çî gunehkarên mezin in! Tu me bidî xatirê welî û enbiyayên xwe, şêx û meşayixên xwe, Xwedê! Sitara Xwedê li ser me be... diyar e, ew ê tofana duduyan li vir, li me ehlê botan rabe ... ew e tenê li Cizira Botan rabe.

⁸⁷ Metê, Gotinên Gunehkar, r. 109

⁸⁸ Metê, Gotinên Gunehkar, r.73,74

De îcar ev gotîna sofî Temir û tofana duduyan di hişê min de diçînge û ez di dest de hîs dikim ku ev gotin ji min ne dûr e. Ne berê û ne jî anuha, bi qasî vê gotîna tofana duduyan û van du peyvikan, ez ji gotineke din netirsiyame, ya arif. Ez ê dûre ji cenabe te re behsa van herdu gotinan jî bikim. Ê loma ez jî di wê gavê de bi tirs û bi mereq jê dipirsim:

- Ya Sofî Temirê delal, dibêjim, ev tofana duduyan, te ji kuderê bihîst û te çima bi lêv kir? Ka rabe, rabe ser xwe û ji min re vebêje.”⁸⁹

“Ew behs û tîrsa wan du peyvikên ku min ji cenabe te re got ez ê dûre vebêjim, a wê çaxê li min hasil bû, ya arif, du peyvikên ku min pê re negêhand û min bi xwe re birin aliyê din, min bi xwe re birin binê erdê. Wê çaxê min xwest ez jî ser gorna xortan vegerim û ji mîre xwe, Mir Zinedin re gotin bi gotin vebêjim: "Ma tu dizanî bê tofana duduyan ji bo ehlê Botan e, mîrê min!" Le wek ku min got, min pê re negêhand. Tajdîn rê neda min û nehişt ez veegerim. Wê çaxê di biniya lingên gorna xortan de, gornek ji min re jî kolan, çend mist axa Cizira Botan kirin çavên min, serî li hespan berdan û çûn. Heqê xwe jî li min helal nekirin.”⁹⁰

2.6. HIN MEKAN Ê HÊMANÊN MÎTOLOJÎK

2.6.1. Kevneşopî

Çawa di her derê jiyanê de karîgeriya mîtolojiyê heye, di nav kevneşopiyên bi civakê re bûne yek de jî têsîra mîtan heye. Mîtolojî bi xwe re fikrek kevneperest jî tîne. Di nav civakên di rêya mîtan de derin de di şûna bav û kalan re çûyîn, gelekî tê dîtin. Ji ber ku mît tenê kare bi vê rêyê derbasî nav civakê bibe mayinde be. Mircea Eliade di pirtûka xwe ya bi navê Taybetmendiyên Mîtan de li ser mîla kevneşopîk û mîtê sekiniye. Wî ev mijar di pirtûka xwe de bi pîrs û bersivên bi qebîleyên pîrîmîtîv re zelal kiriye di ser wan re mînak dane. Ji Arûntuyên Awistiralî pîrsiye çima hinek merasimên xwe bi vî awayî pêk tînin? Ew jî bersivê didin û dibêjin ji ber ku bav û kalên me wisa xwestine û pêk anîne. Cardin ji Kaiyên Gîneya Nuh pîrsiye gelo çima

⁸⁹Metê, Tofan, Peywend, r.43,44

⁹⁰Metê, Tofan, Peywend, r.74

prensibîn xwe yê xebatê naguherînin? Wan jî gotiye ji ber ku Bav û kalên me yê Mîtîk ji bi van prensîban kar kirine û ew jî dixwazin vê yekê bibarêzin⁹¹

Wek ku tê dîtîn ew xwiy û kevneşopiya wek bav û kalan kirin. Ew şaşî an jî bi rîtuêlên ji mezinan hatine elimandin hîn jî li ba gelek civakan berbelav e. Hesenê Metê Di Labîrenta Cinan de dema serlehengê wî qala gundê ku lê dixebite û şênîyên wir dike gelek deveran qala naguherîna wan û kevneşopiyên wan yê eceb dike û dibêje ji mezinên xwe wisa elimîn e û dîtine.

“Gotin hatiye ser gotinê, divê meriv vêya jî bidine zanîn ku di nava Şênîyên gundê me de baweriyeke wusa heye ku dibêjin: li gundê me merivekî bi aqil di dawîya dawîn de dîn dibe, merivekî ji Xwedê re piştî demekê dixerife û li hemberî Xwedê asê dibe; · merivekî dewlemend jî xizan dikeve.”⁹²

Nivîskar di berhema xwe de di vî warî de balê dîkşîne ser aliyê gundiyan yê kevneperest ku çawa bi koretî bi wan ve girêdayî ne, ve rewşê bi awayekî rexne dike û vê hêmana mîtolojîk ya bi kevneperestiyê ve girêdayî dixê navenda berhema xwe.

2.6.2. Kevir

-Belê, ez diçûm...ez diçûm û ji me çêtiran heta destê sibehê bi min kevîr didane kişandin. Wan ew kevîrên zindana xwe ya nû... hamû bi min dan kişandin.⁹³

Mamoste Kevanot, Bekoyê Garût, Hotoyê Navmalok, Mem û Beşîrê Xwendekar ku wek leşgerên şevê tînan bi navkirin hin rojên berê diyarkirî derdikevin seyda çûkan. Di vê derketinê de tiştê balkêş ew e ku kevîrên ku Bekoyê Garût ji bo çeşel lastîk bi kar tîne ji aliyê Leşgerên Şevê ve ku hin zarok in û xwendekarê Mamoste Kevanot in, ji newala cinan tînan berhevkin. Bi jimar in. wek berik bi tesaruf tînan bi kar anîn.

Herdu Leşkerên şevê tînan, tûrê di destê xwe de datînin ber mamosteyên xwe, li kêleka wî cîh didine xwe û bi serbilindî pê didine zanîn ku wan heta anuha jî ji Newala

⁹¹ Mircea Elide, Mîtlarin Özellikleri, Wer. Sema Rıfat, Om yayınları, 2001, r.17

⁹² Metê, Labîrenta Cinan, r.75

⁹³ Metê, Labîrenta Cinan, r.127

Cinan kevirên Gulaver berhev kirine. Fermo binêre ji Newala Cinan berhav kirine.⁹⁴

2.6.3. Kehanet

Kehanet hem Kahîn hem wehiy hem jî cihê kehanet lê hatiye kirin îfade dike. Baweriya bi kehanetan û baweriya bi kahîna di ser mîtan re ketiye nav gel û belav bûye. Heta merev kare bi hêsanî bêje ku îro li gelek derên dinyê bûye cihê pere qezenckirine jî. Ji bo merev kehanetê bike pêdivî bi hin remz û nîşanan heye. Dengê jî dûr ve tîn, hatina bayê bi şid ji aliyekî ve, firîna balindeyan, av û dengê avê, xewn, dengên bi tesadufî hatine bihîstin. Li gora Azra Erhat fikra kahîntiyê ji rojhilat derketiye û belav bûye.⁹⁵

Kahîntî ji Rojhilat hat nav Yewnanan. Kahînan piranî ji sibêroja mirovan agahî didan. Ji nav yezdanên Yewnanan yê ewil hêza ji xeybê agahî diyînê Apollon daye însanan Ev hêz carinan wek ji çûyînek ji ser xwe nêzîkî dînbûne hasil dibû.⁹⁶

Wek ku Azra Erat jî dibêje Kahîntî, di nav Mîten rojhilat de wek hêmanên girîng tê dîtin. Wek mînak Şemanîzm û Falbazî ji hevdu cuda nikare bê fikirîn. Abdulkadir İnan di pirtûka xwe ya bi navê “Tarihte ve bugün Şemanizm” de li ser vê mîjarê disekine. Destnîşan dike ku falbazî yek ji hêmanên girîng yê şemanîzmê ye.⁹⁷

2.6.4. Barûya Babîlê

Barûya Babîlê di gelek pirtûkên pîroz û efsaneyan de cih girtiye. Wek hêmanek baweriyê qala mirovên ser rûyê erdê û baweriyên wan dike. Mirovan jî bo ku karibin xwe bigihînin Yezdan û nêzîktirî wî bibin, bi daxwazek xurt di nav ahengekê de hewl dane ku kûleyek bilind ku ber bi jor ve bilind dibe ava bikin. Piştî wextekî kûle her çûye bilindtir bûye û yezdanê ku vê yekê dibîne jî ji bo her mirovê xebatkarê vê kûleyê zimanekî cuda daye. Ew li çar aliyên dinyê belav kiriye. Ji ber ku mirovan êdî nema ji

⁹⁴ Metê, h.b. 2013, r.116

⁹⁵ Azra Erat, Mitoloji Sözlüğü, Remzi Kitapevi, İstanbul, 1993 r. 17

⁹⁶ Behçet Necatigil, 100 soruda Mitologya, İstanbul, Gerçek Yayınevi, 1969, r.62

⁹⁷ Abdulkadir İnan, Tarihte ve Bugün Şemanizm: Metaryeller ve araştırmalar, Ankara, Türk tarihi kurumu Yayınları, 1954, r.151

hev fam kirine, avakirina kûleyê sekiniye. Bi vê yekê re li ser rûyê dinyê bi hezaran netewe ji bo her neteweyê jî ziman peyda bûye.⁹⁸

Di pirtûka Gotinên Gunehkar de Metê dema lêgerîna Nagînayê de ji bo têgihîştina Behram ya der barê têkiliya yezdan û mirov de, wek hêmanek mîtolojîk Keleha Babîlê bi kar tîne û ji xwendekar re qala ziman û hişê xwe yê tevlihev dike

“Piştî van gotinên wî, êdî nabe ku ez lê mêze bikim. Dixwazim bibêjim, bêtî dudilî, bêtî tirs bêtî şerm ez li çavên wî dinerim, lê ez dengê xwe nakim. Ew nêzîktir tê destê di eniya min re dide û tisyina bi lêv dike. Ez tê nagihê bêtî bi çî zimanî ye, lê ez bawer dikim yek ji wan zimanên tevlihev bû, zimanê ku Xwedê li Keleha Babîlê tevlihev kir. A wê çaxê serwext dibim ku ev tevger û ev ziman, nîşaneyê seremoniyekê ye, seremoniya pesinandina min e...”

Nivîskar di hin derên din yê romanê de carinan bêtî ku navê Keleha Abbîle bi kar bîne qala ziman û tevgera mirovan dike û bi yekê wek hêmanek mîtolojîk di Keleha Babîle de bi kar tîne û di ser vê yekê re qala ziman û fambariyê dike.

2.6.5. Kabos

Li gora Özkul Çobanoğlu di mîtolojiya tirkî de kabos heyberên derasayî ne ku di xew de li ser sînga mirovan rûdin, hewl didin ku wan bifetisînin an jî nihêlin tevbigerin. Ev heyber bi piranî wek nêr tîn sêwirandin. Li gora baweriyê kî çelokekê bi cilê van heybaran veke, wan dîl digire û ew bêje çî bi ya wî dîkin.⁹⁹

Bi rastî di nav kurdan de jî me û gelek kesên ku li gundan mezin bûne bi dehan çîrok li ser kabos û rûniştina wan ya li ser sînga însanan guhdarî kirine.

Metê Di pirtûka Labîrenta Cinan de di hin cihan de qala kabos û xewnên nexweş kiriye.

⁹⁸ Neqîlirin Ayşegül Kılıçaslan, Halikarnas Balıkcısının Hikayesi ve Romanlarında Mitolojik Unsurlar, Yüksek Lisans Tezi, İstanbul, 2010, r152

⁹⁹ Özkul Çobanoğlu, Türk Edebiyatının Mitolojik Kaynakları, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011, r.98.

“Dev û lêv li Mamoste Kevanot zuwa û çavên wî beloqtir dibin, bi serekî tevlihev xwe bi xwe: "Ev destên girêdayî ji kuderê derketin! Kê, kengî, çawa hatine girêdan?" dibêje û ev pirsên ha weke sirekê di dilê wî de bi cîh dibe, Mîxoyê Notirvan û Hotoyê Navmalok anuha tê digêhîjîn ku di wê gavê de ev destên Cindî ne girêdayî bûya, wan ê pê nikanîbûya, seyda ditengije, hêrs dibe, xwe nagire, di ser nivînên nexwe;; de: -Ev çi ye, ezbenî? Destên te çima girêdayî ne? Ma ne va ye em hemû li dora te ne, dibêje û xerîkî vekirina destên girêdayî ye.”¹⁰⁰

2.6.6. Sêhr

Çiqasî bi şûnde jî mabe, tu civakên bê dîn û sêhr tunene. Lê, tevî ku ev aliyên wan tê rexnekirin û nebaş dîtin jî tu gel û civakên ku aliyekî wan yê bi ilmê ve girêdayî tunebe kêş in. Di nav hemû gelên prîmîtîv de ku bi çavekî objektîf û pîspor bê çavderîkirin ew ê bê dîtin ku du qadên ji hev cuda hene. Qada manevî û ya maddî bi gotineke din qada sehr û dînê û ya ilm û zanînê.

Ji aliyekî ve ji bo adet, nerît û kevneşopiyên wan yên pîroz hene ku bi hurmet û rêzdariyeke mezin bi pabendê xurt bi wan ve girêdayî ne. Ev adet, nerît û kevneşopiyên qalkirî bi qedexe, qayde û bi hukmên teqez wek zagon hatine sazîkirin. Ev nerît û kevneşopî bi hêzên derasayî ve girêdayî ne bi taybetî jî bi hêza sehrê ve girêdayî ne.¹⁰¹

“Di her ketineke weha de kesên xwe pêşiyê digêhînin vê hewara Mamoste Kevanot, beriya hertiştî dest û çavên xwe li peydakirina pîvazekê digêrînin, wê pîvazê dipelîxînin û didin ber pozê wî, dûre seyda û feqiyên gund lê dicivin û ilmê oldariya xwe bi kar tînin pirtûkên pîrozwer li ber serê wî vedikin û ayetên cinan di guhên wî de dixwînin, zimanê Xwedê li kaxizan siwar dikin û weke nivîşt û bazbendan pê ve dizeliqînin, bi benên rengîn berbejin û hemeliyan bi hustuyê wî ve dikin.”¹⁰²

“Dema ku meriv di deriyê hêwana vê malê re derbasî hêla hundur bibin, li pişt pencereya odeyê seriyekî rût ê bi ber çavên meriv bikeve. Ev serê rût, serê Ceftoyê gundiye me ye. Her tim parçeyek kaxiz, defter an jî pirtûkek di dest de ye û li ber vê

¹⁰⁰ Metê, Labîrenta Cinan, r.126

¹⁰¹ Bronislaw Malinowski, Büyü, Bilim ve Din, Kabalcı Yayınevi, İstanbul, 1990, r.7

¹⁰² Metê, Labîrenta Cinan, r. 55

pencereyê rûniştî ye. Di rojên sar û tarî de li hêla hundur e, di rojên germ û ronahî de jî li hêla der e. Di hêla hundur de, di dîwarê ber sekûka xwe de refîkeke piçûk çêkiriye, pirtûk û ew hemû kaxizên xwe yên ku têne xwendinê li vir dihevin. Piraniya pirtûkên wî jî van çîrokên oldariyê ne: Rustemê Zal, Hezretî Elî û Kerbela, Hêzên Veşarî, Hunera Fal û Siroveyên Xewnan ... çî dibe bila bibe, di gundê me de yekî ku xwediyê refîkeke pirtûkxane be, ew jî Cefto ye. Her gava ku wext lê were û guhdarekî peyda bike, wê çaxê jî guhdarê xwe re jî van pirtûkan yekî dixwîne. Di xwendina her hevokekê de jî bi qasî sê çar hevokan şîrove dike, dîtînen xwe bi lêv dike ku baş têkeve serê guhdarên wî.”¹⁰³



¹⁰³ Metê, h.b., r. 65

ENCAM

Mît ji rabirdûyê heta roja îro mîratên çandî ne. Di demên berê de bi sedsalan ji bo merev karibe jiyanê fam bike peyvên wan yên têra xwe mufedar çêbûne. Ji mirovê ewil heta îro wek pêdiviyek vegotinê derketine pêş. Mît ji bo mirov hewldana famkirina dinyê û derdora xwe bi xwe ye.

Kurd wek erdnîgarî di navbera gelek çand û şaristaniyên mezin de mane. Kurd wek mirov û civak hema bêje ji hemû dîn û bawerîyan li gelek deverên welatê xwe bawer dikin. Di erdnîgariyêke bi vî rengî de Kurd jî bi awayekî xwezayî ji çand, huner û zimanê derdora xwe sûdwergirtiye bandor li wan lêkiriye û di bin karigeriya wan de jî maye. Ev yek jî wek dewlemendiyeke bêhempa li ser muzîk edebiyat û hunerên dîtbarî ya kurdan zêde kiriye.

Edebiyata kurdan wek hemû edebiyatên din ji hemû cûre zanîn û displînan sûd werdigire. Mîtolojî jî çawa têsîreke baş û mufedar li cûreyên din yê hunerê dike bi heman awayî li edebiyat û ziman jî kiriye.

Hesenê Metê jî wek romannûs û çîroknûsekî kurdan yê berhemdar bi piranî honak û çîroksaziya berhemên xwe li ser bawerî û hêmanên mîtolojîk ava kiriye. Hin mekanên Mîtolojîk ji xwe re bijartiye û bi hin karakterên girîng yê di hemû bawerî û mîtolojiyan de hevpar bi kar aniye.

Me jî wek teza mastera ya bi tez xwest li ser sê romanên wî yên ji aliyê mîtolojiyê ve dewlemend bixebitin û bi awayekî van hêmanên ku nivîskarê me bi kar aniye derbixin holê.

Metê di berhemên xwe de bêtir ji mîtolojiya îslamiyet û îraniyan sûd wergirtiye. Ji Ahûramazda heta Hz. Adem, ji Meydana Golgotayê heta Hecer-ul Eswed gelek hêmanên mîtolojîk bi hostetî bi kar aniye.

Ji bilî van hêmanên ku navborî bi awayekî ji mîtolojiya Kurdan jî sûd wergirtiye. Destana Memê Alan û mîtolojiya Îslamê bender dike û tiştêkî têkel û dewlemend derdixe holê.

Cih û welatên ku lê maye, pîşe û serboriyên Metê bûye sebep ku gelek netewe û gelek mît efsane û mîtolojiyan nas bike. Bi hêza xwe ya xeyalkirinê bi Kurdiya xwe ya rewan, berhemên ji aliyê mîtolojiyê ve têr û tije derxistiye holê. Mîtoloji û xwendinên me yên li ser mîtolojiyê ew ê bibe alîkar ku em berhemên Metê yên di vî varî de xurt bêtir û çêtir analîz bikin û binirxînin.



PÊVEK 1

HEVPEYVÎN BI HESENÊ METÊ RE

1. Hesênê Metê kî ye? hûn karin hinek ji me re qal bikin?

Hesênê Metê di sala 1957an de li Erxeniya Diyarbekirê li gundê Teiyê hatiye dinyayê. Lê Hesênê Metê di diwazde saliya xwe de ji ber sedemên malbatî ji gundê xwe veqetiyaye. Li Mêrsînê dibistana navîn û lîse qedandiye. Lê weke gelek xortên salên heftêyî Hesênê Metê jî di bin bandora siyasetê de maye û hatiye girtin. Paşê jî ji ber darbeya leşkerî mecbûr maye ku derkeve derveyî welêt. Pêşî li Îranê û paşê jî li Iraqê tevî refên peşmergeyan bûye. Piştî sê salên peşmergetiyê di ser Sûrî re çûye Swêdê. Ew bi qasî 30 salan e ku ji welêt dûr e. Hin kitêbên wî ji bo erebî û tirkî (Tofan, Labîrenta Cinan û Gotinên Gunehkar) hatine wergerandin, hinek jî li şanogehên Amed û Stenbolê(Epîlog) bûne piyes. Wî bi xwe jî ji Pûşkîn, Çexov, Dostoyevskî û Göran Tunström bo kurdî werger kirine. Gelek kurteçîrokên wî di antolojiyên tirkî, û almanî de cih girtine heta nuha gelek berhem û wergerên Hesênê Metê hatine çapkirin. Hesênê Metê nuha jî li Swêdê li bajarê Stokholmê jiyana xwe didiomîne.

2. Dema ku merev li berhemên we li karakter û mekanên ku hûn pê çîroksaziya xwe dihûnin dinêrin, meriv dibîne ku hûn li hemû cih û warên welêt, bi karakterên ji hevcuda xwînerên xwe digerin û cardin heger merev nivîssandinê jî wek lêgerîneke qebûl bike, hûn li çi digerin?

Bersiv: Di yanzdehsaliya xwe de ji gundê xwe, di hîjdehsaliya xwe de ji bajarê xwe, di bîst û pêncsaliya xwe de ji welatê xwe dûr ketim. Û anuha şêst û sê salî me. Di karakterên berhemên xwe de, ne ku ez dixwazim wan li deverna bigerînim... û nizamim gelo ez jî dixwazim li wan deverna bigerim an ji ber pêdiviya vegotina bûyerê ye. Lê tiştê ku ez dizanim, tiştêkî welê ye ku nizamim û nikarim îzah bikim. Çawa bibêjim... wek zarokê ku ji zikê dêya xwe bibe û careke din nikanibe li cîhê berê vegere... tiştêkî welê. Lê dibêjim, ev jî ne tiştên ewqas seyr û dûrî aqilan e. Ji bo min

tiştê herî girîng ew e ku aya di hûnandina berhemekê de asta pîvaneke edebî ê çêbe an na, aya di gotin û vegotinê de samîmiyet ê hebe an na. Tiştê herî girîng ew e. Û dizanim ku di nivîsandinê de ez tenê li vê yekê digirim. Bi çiqasî nêzîkî vê yekê dibim, ez nizanim.

3. Helbet her tişt û her kes kare bibe mijara berhemeke edebî an jî karekî hunerî, lê tiştêkî gelekî êşkere di berhemên we de xuya dîkin heye ew jî dîn û mîtoloji ye. Gotinên Gunehkar, Labîrenta Cinan, Li dêrê, Tofan we hema bêje di hemû berhemên xwe de pir an hindik ji mîtoloji û ji dîn sûd wergirtiye. Hûn karin li ser vê yekê çî bêjin?

Bersiv: Çi nakokî û problemên ku di civak û kultura wê civakê de hebin, berî herkesî û hertiştî tesîrê li ruhiyeta hunermendan dike. Ev tişt ji bo hunermendên şaxên hemû huneran welê ye. Lewra dilê hunermendan teniktir û ruhiyeta wan hesastir e... ku em bidin ber xelkên normal. Bifikire çima resamekî îro ranabe weke Leonardo da Vinci tabloyeke bi navê *Şîva Dawîn* li dîwarê dêrekê çênake? An jî çima resamekî mîna Michelangelo ranabe îro *Afirandina Adem* li bin banê dêrekê neqîş nake? Dêr hene, dîwar hene, resamên jîr hene û xelkên xirîstîyan jî hene. Dibêjim ev yek ji ber asta kultura civakî ye. Îro ji bo mesîhiyekî êdî zêde ne girîng e ku di *Şîva Dawîn* de çî bûyer qewimîn û çima Judas bû sedema êşa mezin, ji bo xiristîyanekî êdî ne girîng e ku bizane Xwedê çawa Adem afirandiye.

Ku ez werim ser pîrsa te: Motîfên Gotinên Gunehkar, Labîrenta Cinan, Li dêrê û Tofanê di civata me de, di kultura me û wan hemû welatên rojhilata navîn de hîn jî pîrsgirêkên mezin in. Hîn jî serê xwe di ber wê yekê de dêşînin ku dema Xwedê ji ax û çamûrê Adem çêkir, gelo ka li nav wê çamûrê xistibû an na. Yan jî di kitêbên dersê de ji zarokan re bahsa wê yekê bikin ku li hecê meriv çawa Şeytên kevir dike. Û sala îsal jî 2020 piştî Îsa ye. Ma ev ne êş e, ev ne problem e, ev ne nakokî ye, ev ne bûyerên ecêb in? Beriya herkesî û hertiştî hunermend vêya hîs dike. Loma ji bo xwe dike motîf û mijar: risim dike, dike helbest, dike muzîk, dike roman û novel. Ma min çî jê ye Xwedê ka li nav çamûra Adem xistiye an na? Ma min çî jê ye Xwedê kî ji axê û kî ji rêxê çêkiriye? Ku di çanda civakekê de ev tiştên welê hîn jî bêne minaqeşekirin, bawer nakim ew ê bigêhîjin netîceyekê... netîceya çamûra hezretî Adem û kayê.

Hurmata min ji bo hemû baweriyên û pîroziyên hemû bawermendan heye. Bi van mijar û motîfan, bi van berhemên ne ku ez dixwazim hinekan ji rêya wan bikim, an jî hinekan bînim ser rêyeke din. Na. Tenê tiştê ez lê dihizirim ew e ku dibêjim ev motîfa nefsî û civakî çawa dikane bibe berhemeka baş û edebî. Baş û edebî dibin an na, ez nizanim. Lê di hîlbijartina mijar û motîfan de tiştê ku ez li pey, tiştê ku ez li dû me... ev e.

4. Di berhemên we de ji mîtolojiya Yewnanan heta ya sumeran ji ya Farisan heta ya Îslamê şop û karigeriya gelek cûre Mîtolojî hene. Terciha we ya di vî warî de û wek pîrsa di hundirê pîrsê de çavkaniyên we yê li ser mîtolojiyê çi ne?

Bersiv: Dema ku di hûnandina berhemekê de însan, kaînat, Xwedê, Şeytan, dîn û mîtolojî hebe, bêguman çavkanî û referensên hunermend jî ew materyalên li ser van beşan in: Tekstên dînî, tekstên mîtolojiyê, vedîtîna arkeolojîk, kitêbên pîroz û gelek tiştên din hene. Dema ku ez di berhemeke xwe de bahsa wê yekê bikim ku: rojek hat û Xwedê ji afirandina însanan peşîman bû, bêguman referensa min ê tekstekî dînî be, ew ê Tewrat be.

5. Heta nuha gelek romanûs û çîroknûsan kesayetên mezin yê mohra xwe li dîrok û zimanê kurdî xistine di berhemên xwe de bi cih kirine. Romanên biyografîk an yê dîrokê nivîsandine. Lê we di novela xwe Tofanê de yek ji karakterên bi nebaşiyê re bûye hevî; Bekoyê Ewan li Cizîra nuha û li welêt vegerandiye û berhemeke ciyawaz derxistiye holê. Gelo hûn ê ji bo pêvajoya afirandina çîroksaziya berhemê çi bêjin?

Bersiv: Di sala 1998an de min dest bi Tofanê kir, di sala 2000î de çap bû. Balkêş e, di wan salan de Bekoyê Ewan li ser mekanê hezretî Ahmedê Xanî gazinan dike ku çima navê derewîn û gelaciyê bi pey wî xistiye. Bahsa derewîn û gelacên îroyîn dike, bahs dike ku Cizîra Botan bûye Cizîreka Xopan... û bîst salan piştî çapa kitêbê ew gotinên Bekoyê Ewan mîna vedîtîna Nostradamus rast derdikevin û Cizîra Botan dikeve rewşeka din. Ezîziya Bekoyê Ewan jî ev e, dibêjim û loma ji Bekoyê Ewan hez dikim.

6. Di pirs a me ya di destpêkê de we qala hatina xwe ya ewropayê kir. Gelo dûrketina we ya ji welêt, an jî dûrketina we ya welêt ya ji neçarî karîgeriyek li ser berhemên we kirine heger kiribe çawa? Hûn edebiyata xwe û berhemên xwe wek berhemên sirgûnê bi nav dîkin nerîna we cawa ye gelo?

Bersiv: Na, ez berhemên xwe weke berhemên sirgûnê nabînim, kêmasî û tengasiya zimanê kurdî ji bo min çênebûye, ti karîgeriyeka dûrbûna ji welêt jî li ser min tune. Ez baş nizanim ji ber çî ye, lê dibe ku ji piçûktiya xwe ve derketime loma. Ku îro jî li Diyarbekir bim, dibe ku mijar û motîf bêne guhertin, lê di stîla hûnandin û hîsên min de bawer nakim guhertinên radikal çêbe. Lê min gelek kes dîtine ku dûrbûna wan a ji erd û welatên wan tesîreke neçê li wan û ruhiyeta wan kirine.

7. Û meseleya ‘êş’ ê di çîroka we ya bi navê “Êş” de karekterek bi navê Darînê Daryo heye, îro merev kare bêje ku yek ji navdartirîn karekterê edebiyata me ew e. Darîn, li odeya xwe ya xebatê bi Mîr Celadet re dikeve diyalogekê (bi rastî ew monologek e.) û ser êşa xwe ya ku nikare binivîse re qala êşa gelê xwe, bindestiya wan û rewşa zimanê xwe dike. Di ser têgeha êşê û wek karekterê navdar li ser Darînê Daryo karî çî bêjî?

Bersiv: Bêguman ev dîtînen te ne, lê ji bo min jî cîhê şanaziyê ye. Roja ku ez jî bibînim navê Darînê Daryo li pêş navê min e, hingê ez ê serwest bibim ku di qest û mebesta nivîsandina xwe de bi ser ketime. Ez ê kêfxweş bim ku Darînê Daryo weke seydayekî mizgeftê li pêş min û navê min be. Lewra di edebiyata xelkê de jî gelek û gelek nimûneyên welê çêbûne ku îro jî navê nivîskar û berheman bêtir, em ji karekterê wê berhemê hez dîkin, an jî tenê ew karekter tê bîra me. Raskolnikov, Oblomov, Don Kîşot... meriv ji wan hez dike.

8. Di berhemên we de vegotîneke we ya postoral heye, dema ku hûn qala êşê bikin jî û dema ku hûn qala xweşî û berîkirina welêt bikin jî hûn her bi devereke an jî tişteke gundewariyê re girê didin û diresimînin? Îjar hûn vê yekê bi çî ve girê didin?

Bersiv: Baş nizanim, lê di dema me de jiyana gund û gundewariyê xweş bû, pir xweş bû. Belkî ji ber vê yekê ye, an jî zû ji gund derketime loma. Lê dîsa jî dibêjim,

pêdiviya hûnandina berhemê pê heye. Pêdiviya berhemê bi çi û çawayiyê hebe, dibêjim nivîskar welê dike û divê welê bike.

9. Gelo hûnçima bersivên kurt tercih dikin?

Bersiv: Min ti carî ji dirêjî û zêdehiya nivîsan hez nekiriye. Welê dizanim ku gotin xwediyê îzet î nefsekê ye. Ne tiştekî welê ye ku wext bêwext meriv bi kar bîne, bêyî sedem li pey hev rêz bike û ji pêwîstiyê zêdetir pê nivîsê dirêj bike. Eva ji bo nivîsandina berhemên jî welê ye. Ez hez nakim ku berhem qelew be.

10. Mamoste mala we ava be. Em spas dikin ji bo hevpeyvînê.

Bersiv: Gelek sipas û hêviya serketinê li we dikim.

PÊVEK 2

KURTEYAROMANÊN METÊ

TOFAN

Tofan çîroka piştî sê sed û sê salan ji nû ve vegera Bekoyê Ewan a ser rûyê dinyê ye. Di vegêrana çîrokê de du vegêran hene yek jê em navê wî nizanin li Agiriye hatiye serdana Sofî Merwan ku mala wî nêzikî Gora Ehmedê Xanî ye. Yê din jî Bekoyê Ewan bixwe ye. Çîrok bi diyalogên Dildarê Xanî û Safî Merwan dest pê dike. Dildarê Xanî ji Sofî tika dike ku wî bibe ba Xanî ku karibe fatiheyê bixwîne.

“Ez û sofî Merwan em dadikevin jêr. Li jêr sê caran em li dora gorna pîroz çerx dibin, li ser lingan li ser çogan em destên xwe vedigirin û ji bona hemû ruhên pak em bangî Xwedê dikin. Dûre em radibin hildikişin jor û diwana alimên îlahî, li wir li ber pencereyê sofî Merwan cihekî bi kulavên mor û palgiyen bi rûbendên nexşandî nîşanî min dide û dibêje:

- Kerem bike... a li vê derê li evî cihê miqedes di wexta xwe de Beduizeman ji li pêş ve pencereye rûniştiye û li gorna ezîz temaşe kiriye.”¹⁰⁴

Dildarê Xanî li wir li ber wê pencereyê rûdinê dia dike. Bextewer dibe ku bûye para wî dîtina gora cenabê ezîz. Dilê wî germ dibe û çavên dixwaze xwe bigire. Dibîne ku pêjna camêrekî ji aliyê jêr ve tê. Dildarê Xanî dengê xwe nake tenê guhdarî dike. dixwaze fam bike ka ev camêr kî ye û ew ê çi ji cenabê ezîz re bibêje.

Ew ê ku tê Bekoyê Ewan e. Li gora ku ew qal dike Ehmedê Xanî piştî ku şakara xwe Mem û Zîn nivîsandiye ji Xwedayê dilovan lawa kiriye ku ew her ji sêsed û sê salan carekê Bekoyê Ewan bişîne ser rûyê dinyayê.

“Ya qadirê erd u asiman!

¹⁰⁴ Metê, Tofan., r.14.

Ez evdeki te î ji axê Ahmede Xanî,

ji cenabe te î zulcelal lava dikim ku bi destûr û fermana Te,

ji îro û pê ve her sêsed û sê salan carekê Bekoyê Ewan bi rûyê vê
dunyayê bikevit.

Qesd û mexseda ji ev ê lavayê ne ew e ku bêmarîfetiye bibit,

na a bîlekis, belkî jî mebest ew bit ku ev hîkmet

mislî lutfeye Yezdanê erş-î ala bibit îbret- î millet.

Hurmetkare cenabe Te i Mezin,

Ahmede Xani

21e meha muharreme 1695”¹⁰⁵

Bekoyê Ewan çend roj berê li Cizîrê ji gora xwe ya li ber lingên Mem û Zînê derdikeve ji wan pêlikên kevnare derdikeve jor û bi cilûbergên xwe yên kevn li dora xwe dinêre. Dibîne ku sofîyek li hewşa mizgeftê dihere û tê. Silavê dide wî hinekî dipeyivin. Jê re tenê navê xwe dibêje navê min Beko ye. Lê ew camêrê bi navê Sofî Temir jê bawer nake. Dibêje tu ne ji vir î, û nabe ku navê te Beko be, ji ber tu kes wî navê bêyom li kurê xwe nake. Beko jî fam nake dibêje çima ew ê lê nekin. Camêr jî qala Bekoyê ewan dike ku çawa ketiye navbera Mem û Zînê. Bi vî awayî çend rojan li Cizîrê dimîne çavdêriya gel û bajêr dike. Li hewşa çayxaneyekê civînek çê dibe. Camêrek bi navê Cîhangîr ji gel re behsa hin asasên hukma xwe dike. Xortekî bi navê Delyan li hember wan derdikeve û bavê xwe yê ji aliyê wan ve hatiye kuştin tîne bîra wan.

“- Ev hemû kesên li vir... beyî te, ev hemû kesen li vir min nas dîkin û pê dizanin bê ez kîme. Lewra ez di hewşên wan de mezin bûme. Lê ... ji van kesên li vir yek jî nizanin bê tu kî yî fi ji kuderê hatiyî vir. Û anuha ez ji te re ... ji te re jî bibêjim

¹⁰⁵ Metê, h.b., r. 72

bê ez kî me. Ez Delyan im, ji bizrê erdê Botan, lawe Bêzanê Memborî me. Nizanim be ev nav tişteki bi bîra te tine an ne. De ka îcar tu bibêje, ji kerema xwe re bibêje ka tu kî yî, ji kuderê hatiya ku ji ehlê Botan re kum û kalazan vediçinî!”¹⁰⁶

Ew xort ji ber ku li ber wan radibe wê rojê ji aliyê wan ve tê kuştin. Wek ku me di serî de jî gotibû, Beko ji Cizîre radibe dihere ba gora Xanî û gazinan jê dike çima wî ew ewqas nebaş nîşan daye di manzûmeya xwe de. Heger ne ew bûna ew ê çawa evîna wan xortan bibûna destaneke mezin yanî em bi kurtasî be jî bi zimanekî gazinokî çîroka Mem û Zînê ji devê Beko jî guhdarî dikin.

GOTINÊN GUNEHKAR

Xortekî bi navê Behram, Behramî Kawaşî ji bajarê xwe hatiye bajarê E'yê (Di romanê de wiha tê binavkirin) ew ê li medreseya dînên îlahî beşa îlahiyatê bixwîne. Rojekê dema ku li mizgeftê destnimêj digire li Lûlû Xanê *zarxweş û xwîngerm* rast tê. Ji hev hez dikin û bi hev re nimêj dikin. Di wê sohbeta hevnasînê de Behram jê re qal dike ku ew ji xwe li malek kirê digere, Lûlû xan jî pê dide zanîn ku maleke wî ya vala heye û heger dil bike kare bi kirê bide wî. Piştî ku li hev dikin, Lûlû xan wî dawetî gundê xwe dike û heger were ew ê karibe ji xwe re hejîran û tirî bi xwe re bîne. “ji rojên Xwedê şemiya payiza navîn e, li dereke bajêr li otobêsekê siwar dibe û li gundê Argonê dadikeve.”¹⁰⁷ Li wir dema ku li derve taştê dixwin, Behram li ser paceya wan ya ji keviran marekî dibîne û dil dike ku wî bikuje lê Geştîna Xanima jina Lûlû xanê mazûvanê wî, nahêle, ji cihê xwe rabe. Geştîna Xanim pê dide zanîn ku ew marê wan yê malê ye û bêzerar e. Behram şaş dimîne û cihê xwe ranabe. Paşê Geştîna Xanim qala bavê xwe Mokrûs û çîroka marê wan ê malê dike ku marekî reş dema ku bavê wê bîra mala wan ya gund dikole ku nuha ji cihê ku lê taştê dixin jî xuya deke, du hevalên xwe jî bi heq ji bo alîkariya wî bikin digire. Dema ku dikolin kûpek zêr dibînin. Mokrûs efendî bi awayekî pê dihisîne ku havalên wî yen bi hev re bir kolane ji bo para wî ya zêrên ku bi hev re dîtibûn, dixwazin wî bikujin. Lê vî marê ku nuha ji Behram xuya dike bi alîkariya wî ve tê û nahêle wî bijehirînin. Paşê Lûlû Xan Behram derdixe jora mala wan cîhên bilind şikeftinan û gora Mokrûs efendiyê xezûrê xwe û mezintirîn

¹⁰⁶ Metê, h.b. r.54

¹⁰⁷ Metê, Gotinên Gunehkar r. 12

şikefta sukurê ber mala xwe ku “li jora zikê vê Şikefta Mezin peykerê jineke qelew, tazî û bi pêsîrên mezin di zinê de hatiye kolan.” Geştîna Xanim qala çîroka peykerê jinê ku îro çawa ji jinên şîrê wan nayê re çawa dibe hêvî û piştî ava ji serê wan pêsîrên mezin diniquete vedixwin çawa bi awayekî îlahî şîrên wan pir dibin qal dike, ta bi derziyê ve vedike. Piştî ku dadikevin jêr ber malê keç lawek cêwî zarokên Geştinayê tevî tiriyê ku ji nav erd dane hev, tên malê, Mazûvanên wî wan bi hev re dide nasîn Nagîna qîza wan û Aryên kurê wan yên cêwî ne. Lê ne wek malek gundiyan wek zarokên li bajêr mezinbûyî bi destê wî digirin û xêrhatinê lê dikin. Ew bi vê yekê şaş dimîne. Dema ku Nagînaya qîza wan sawanên ji bo raxistina bastêqê dişo bi lingên xwe yên tazî pê li wan dike dibîne, dilê xwe dibijîne xweşikbûna Nagînayê û dil dikeve wê. Piştî demekê dibîne ku nikare çavên xwe ji wê biqetîne, radibe derdikeve jora xênî ku hem karibe Nagînaya mîna “dotmîrekê xweşik” baştir bibîne hem jî kes nizanibe ku ew li wê dinêre. Ji jor li wê dinêre û qala xweşikbûna wê dike lê em baş tê nagihêjin gelo dikeva an xewnerojekê dibîne, Nagînayê di wî hewdê mezin de tazî ye, û ji bo pevşabûnê bang wî dike. ew jî bi ber wê ve dere paşê ew di cihaneke efsûnî de derdikevin rêwîtiyekê di vê rêwîtiyê de Nagîna ji bo jê re avê bine dere, ew jî bi pey wê dikeve. Piştî ku ji xewna xwe şiyar dibe vedigere bajêr. Her du zarokên Lûlûxan dimrin.

LABÎRENTA CINAN

Roman qala çîroka Kevanot dike, Çîroka Mamoste Kevanot ku di destpêka berhemê de ew û xanima xwe bi hev re bijarê “D”yê diherin gundekî. Kevanot nuh wek mamosteyekî li wir hatiye peywidarkirin. Erebeke wan ya kevin heye. Dawiyê bi flaşbekekê dihere xwestina xanima Nagînayê ku bavê wê ewil nexwestiye wê bide Kevanot;

“Nabe, xoce, nabe! digot.(Bavê Nagînayê)Min nêhirî nabe, vê carê jî min xwe havêt bextê wî û jê re got: “-Rast e, Apê Simko, ez ne ji eşîra we me, ez ne çiyayî û ne jî deştî me. Wek ku tu jî bi kerem dibêjî, ez bajarî me. Lê beriya hertiştî, ez jî merivek im. Merivekî ji we me, zimanê me, dîroka me, berbora me... ken û giriyê me yek in. Çima dildariya koçerekê, nebe para min? Binêre, Apê Simko, ku ev tevgera min dûrî berborê be, wê çaxê ez dikanim xwe bavêjim bextê ciwamêrekî û bila ew were keçikê

bixwaze. Çîrokek dirêj e, lê di roja îroyîn de min ne dê û ne jî bav heye. Loma min xwest ku tu baviyekê ji min re bikî û ji vê daxwaza dilê min re nebêjî na ..."108

Berî ku Kevanot were gund, jê re dibêjin ew der gundê dînan e û şîretan lê dike û dibêje bila wer hefsarê wan di destên te de be. Tu xwe bi destên wan ve berdî tu yê bibî wek wan û tu yê jî dîn bibî. Kevanot li gund bi cih dibe. bi erebeya xwe ya kevin dema ku lazim dibe dihere bajêr û tê, bi gundiyan re eleqedar dibe. Xortekî bi navê Gabranê Baço ku bavê wî dixwaze bi gundiyeke wan ya cuwan re bizewice, ji gund aciz dibe, ji bavê xwe aciz dibe, û ji gund dihere, berî ku here hinek qaxiz ku wek kitebekê bi ber hev aniye dide Kevanot jê re dibêje hayê te ji gundiyan me hebe ew cahilin ew ê te dîn bikin. Di pirtûkê de jî kî ye, malên wan li ku ne çî karî dikin qal dike. Kevanot pirtûkê dixwîne gundiyan nas dike hêdî hêdî, bi wan re dibe heval, dihere seydê, dihere mêvandarî. Bi wan re dibe heval hêdî hêdî çûna xwe ya bajêr kêr dike rojekê xanima wî xewnekê dibîne yek di xewnê de dibêje ew ê zaroka te ji te re nemîne. Bi rastî jî wiha dibe, Kevanot dîn dibe xanima wî jî zarok ji ber dihere. Lê di vê navbêrê de gundî tîr naskirin, mekan û însanên ecêb tîr sêwirandin. Û bûyerinin nejrêzê diqewimin.

¹⁰⁸ Metê, Labîrenta Cinan, r.8

ÇAVKANÎ

- Akalın, Sami:*Edebiyat Terimleri Sözlüğü*,5. Baskı, İstanbul, Varlık yayınları , Ocak 1990
- Aksoy, Gürdal:*Kürt Dili ve Söylenceleri Üzerine İncelemeler-1*. Ankara, Öteki 1991.
- Ayazoğlu, Beşir:*Geçmişi Yeniden Kurmak*, İstanbul, Kubbealtı Neşriyatı, 1987.
- Aysun, Çetin:*Tazminattan Cumhuriyete Türk Aydınlarının Mitolojiye Bakış Tarzı*, izmir, Teza lîsansa Bilind.
- Bilgin, Siraç: 1996. *Aryan Mitolojisi, Yazatalar ve Homa*. İstanbul: Doz.
- Borator, Pertev Naili: “Türk Efsaneleri” Folkloru Doğru” Sayı: 35, Mayıs –Haziran 1974.
- Can, Şefik:*KlasikYunan Mitolojisi*,İstanbul, Kabalcı Yayınevi, 1970.
- Caner, Fırat:*Büyük Tufan Mitleri ve Atra- Hasis*, Karadeniz Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, 2017, j.3.
- Corm, Georges: *Avrupa ve Batı Miti Bir Tarihin İnşası*. Wer M. Işık Durmaz. İstanbul, İletişim, 2011.
- Çobanoğlu, Özkul:*Türk Edebiyatının Mitolojik Kaynakları*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011.
- Dan, Ben- Amos: “Şartlar Ve Çevre İçinde Folklorun Bir Tanımına Doğru”, Wer: Metin Ekici, Milli Folklor, jimar: 33, Bihâr 1997.
- Demir, Vecdi:*Kurdên Arî: Mît, Dîrok û Îdeolojî*, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin, Teza Lîsansa Bilind, 2019.
- Easy, Someyah:*İran ve Türk Mitolojisinde Ay ve Gönüş ile alakalı Tacavurlar*, İzmir Yüksek lisans Tezi,2010.
- Elide, Mircea:*Mitlerin Özellikleri*, wer. Sema Rıfat, Om yayınları, 2001.
- İnan, Abdulkadir:*Tarihte ve Bugün Şemanizm: Metaryeller ve Araştırmalar*, Ankara, Türk tarihi kurumu Yayınları, 1954.
- Malinowski,Bronislaw: *Büyük, Bilim, ve Din*, Kabalcı, İstanbul, 1990.
- Metê, Hesenê:*Gotinên Gunehkar*,Peywend, İstanbul, 2013.
- Metê, Hesenê:*Labîrenta Cinan*,Peywend, İstanbul, 2013.
- Metê, Hesenê:*Tofan*,Peywend, İstanbul, 2013.

Öztürk, Mustafa: “Kur’an, Kitab-ı Mukaddes ve Sümer Mitolojisinde Hâbil-Kabil Kıssası”, Ç.Ü.İlahiyat Fakültesi Dergisi, Cilda 4. Jimare 1, 2004.

Necatigil, Behçet: *100 Soruda Mitologya*, İstanbul, Gerçek Yayınevi, 1969.

Özlem, Sert: *Umudun Tarihine Yolculuk Yedi Uyurlar Efsanesi*, Phoenix Yay., Ankara 2009.

Parlatır, İsmail: *Türkçe Sözlük*, Ankara Dil Kurumu Yayınları, 1998.

Grimal, Pierre: *Mitoloji Sözlüğü Yunan ve Roma*, wer. Sevgi Tamgüç, İstanbul, Sosyal Yayınlar, 1997.

Ritter, Hellmut: *Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi Karşılaştırmalı Edebiyat Metinleri*, İstanbul, Ayrıntı Yayınları, 2011.

Sert, Özlem: *Umudun Tarihine Yolculuk Yedi Uyurlar Efsanesi*, Phoenix Yay., Ankara 2009.

Tökel, Dursun Ali: *Divan şiirinde Mitolojik Unsurlar-Şahıslar Mitolojisi*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2000.

Nimet, Yıldırım: *İran Mitolojisi*, Nüsha, S.2, J.7.

http://tr.wikipedia.org/wiki/İslam_mitolojisi

http://tr.wikipedia.org/wiki/yunan_mitolojisi

http://en.wikipedia.org/wiki/Christian_Mithology



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

HESENÊ METÊ ROMANLARINDA MİTOLOJİK UNSURLAR

HALİL ABDÜLSEMETOĞLU

167110038

Danışman

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mardin 2019